## Serîrakirina peyvan

Di helbestên Jîla Huseynî de hewldaneke rewşenbîrî, femînîstî, evîn û dengê jinê derdikve pêş. Wê emrê xwe di rêya lêkolînê de derbas kir. Jixwe ev aliyên wê û pênûsa wê ya bisihr hîşt evçend bihêz peyvan li ser rûpelên sipî ên lênûsa xwe xîz bike... *Zehra Mohammedzadeh / R.2*

## Leyla Qasim

Gelek helbestvan û stranbêjan qala qehremaniya Leyla Qasimê kiriye û li ser wê helbest û kilam nivîsîne. Şêrko Bêkes, Tîrêj û gelek helbestvanên ereb yên mîna Udunîs di helbestên xwe de qala canfedayiya wê kirine... *Xunav Elban / R.6*

## "Nexşên Li Giyan"

Hebûn an nebûn, êş, estetîzekirina êşê, meş, windabûn, wêrekî, tunebûna fizîkî û afirandina hebûneke ruhî/giyanî... Nivîsandina nexş û şopên li welatekî, vebeyîna hebûneke giyanî... Romana Dilawer Zeraq a bi navê Nexşên Li Giyan... *Sîdar Jîr / R.8*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

11 - 17 Gulan 2020
Hejmar: 21
Buha: 4 TL

www.xwebun.org

rojname@xwebun.org


# Cejna ziman pîroz be!

Ew qas xemsarî bes e, divê têkoşîna mirov jî bi zimanê mirov be. Divê ziman di hemû qadên jiyanê de bê bikaranîn û li nifşên nû jî bê veguhastin. Eger bi rastî ziman hebûn û xwebûn be, nexwe em xwe qet bi vir de û wê de nedin, ji xwe re li hincetan negerin û karê îro nehêlin sibehê. Ziman çand e, nasname ye, hebûn e. Xwebûna xwe bi zimanê xwe bidomîne. Cejna zimanê kurdî li me hemûyan pîroz be...

*Zana Farqînî / RÛPEL - 5*

## Mizgîna xwedî nav û deng

Hozan Mizgîn bi deng, stran û têkoşîna xwe bû parçeyekî civaka Tetwanê. Êdî gel Mizgîn wek jineke Tetwanê dihesiban û bibû Mizgîna Tetwanê. Jixwe di roja me ya îro de jî dema navê Hozan Mizgînê tê gotin an jî stranên wê tên guhdarkirin yekser Tetwan tê bîra gelê kurd. Mizgîn a ku bi deng xwe reng dida têkoşîna azadiyê û bi stranên xwe dibû çem û di dilê gelê kurd de diherikî...

*RÛPEL - 2*

## Egîdekî muzîkê

Evdilmelek Şêx Bekir, li Enqereyê dest bi xwendina tibê dike ji aliyekî jî bi wî dengê xwe yê bihuştî distrê. Li dû wî hevalên wî belgefîlmek hazir kirin. Ji ber gelekî dereng ev fîlm hate çêkirin, navê "Zêmara Derengmayî" lêkirin. Evdilmelek egîdek bû ji muzîka kurdî re. Agirê ku di muzîka komên kurdî de vexistiye hîn venemiriye. "Kulîlka Azadî"yê ye, her sal di meha nîsanê de vedibe û bêhn dide... *Mefer Kurdil / R. 11*

## Stûneke hunera kurdî

Hunermend Seîd Gabarî stûneke hunera kurdî ku bêhtirî 40 salan e stranên kurdî çêdike û dibêje û xizmeta huner û folklora kurdî dike. Gabarî di 64 saliya xwe de koça dawîn kir. Nemir Seîd Gabarî di sala 1966'an helbestvanên kurd ê navdar Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj nas dike û herdu helbestvanan bandoreke mezin lêkiriye û her wiha alîkariya wî kirine û han dane bo strangotinê... *Hozan Emîn / R. 11*

# Li derve negerin vîrus di hundirê malê de ye

Li gorî daneyên dawî heta niha li tevahiya cîhanê nêzî 4 milyon kes bi vîrusa koronayê (Covid-19) ketine û nêzî 300 hezar kesan jî canê xwe ji dest dane. Ji destpêkê heta îro der barê mijarê de gelek nirxandin û şîrove hatin kirin. Pêvajo ji nêz ve hat şopandin. Bandora vîrusê ya li ser dewlet û civakê, siyaset û aboriyê, xweza û mirovahiyê bi her awayî di vê pêvajoyê de hat şîrovekirin. Ji bo xweparastina li dijî vîrusê her tim bangewaziyên "Li malê jiyan xweş e" û "li malê bimînin" hatin kirin, lê belê dengê jinên li malê hatin kuştin û bi şîdetê re rûbirû man nayê bihîstin. Jin bi kujer û êrîşkaran re rûbirû hatin hiştin... *RÛPEL - 7*

## Bidestxistina mafê navdanînê!

*Ramazan Olçen / RÛPEL - 5*



## Ziman nasnameya berhemê ye

Nivîskar Pîr Rustem pirsên rojnameya me bersivand û wiha got: "Ziman nasnemeya çand û edebiyatê ye. Zargotina kurdî yek ji zargotinên herî zengîn e di cîhanê de, miletê me her tiştê xwe bi devkî ji me re hiştiye... *Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4*

## Çimeyê heme nêweşîyan

Ma zanê bi destpêkerdişê pergala kapîtalîste dir zehf zerar dîya xoza û ganeyê bînan ê rîerdî ro. Bi zihnîyet û kerdişanê kapîtalîzmî serre bi serre aşme bi aşme atmosfer zêdetir xerepîya, feleketê hewa û derdorî pêsero nêbî kêmî. Kapîtalîzmî hem qiwet û aqilê însanî hem zî heme çimeyanê xoza rayîrê sermayeyê xo de xerc kerd û helbet bê şik hetkarîya pîle zî pergalê netewedewletan ra girot û hema zî gêno. Çimeyê heme nêweşîyan kapîtalîzm û dagirkerî yo... *Nesrîn Namdar / R.9*

## Rewşenbîrekî mixrikî xwe bûyî: Edward W. Said

Çîrokeke balkêş e, di dawiya sala 1992'yan de BBC gava dest pê dike Rêzegotarên Reithê radigehîne cîhanê, xebatkarên dezgehê seba ku pêşkêşiya bernameya gotûbêjan ji rewşenbîrê filistînî yê navdar Edward W. Saidî xwestine, tek tûk be jî tûşî rexneyan dibin...

*Şener Ozmen / R.11*

# Mizgîna xwedî nav û deng

Êdî Mizgîn bibû stran û wek stranên xwe di nav gelê kurd û jinan de bibû nav û deng. Ew êdî bi rêya stranan dibû mêvanê dilan. Dilên ku bi stranên wê coş dibûn û xwe nas dikirin

Navenda Nûçeyan

Stranên Hozan Mizgînê ku bi dengê xwe tev li têkoşîna azadiyê bibû, tevî 28 sal di ser şehadeta wê re derbas bûye jî hê wekî roja ewil di nav gelê kurd û jinên kurd de olan dide.

Gurbet Aydin a bi navê Hozan Mizgîn di nav gelê kurd de tê nasîn, di sala 1962'yan de li gundê Bîleyderê yê Êlihê tê dinê. Mizgîn demeke kurt beriya pêkhatina darbeya 1980'yan bi komeke ciwan re li Êlihê tev li nav refên têkoşînê dibe. Lê piştî demekê di sala 1983'yan de, ji bo xebatên çand û hunerê derbasî Ewropayê dibe û li wir pêşengiyê ji xebatên çandî re dike.

Hozan Mizgîn ku bi taybetî bi stranên 'Çemê Hêzil' û 'Gundîno Hawar' tê nasîn, di wan salan de bi stranên xwe yên ku tê de behsa têkoşîn, berxwedan, êş û jiyana gelê kurd dike, xwe digihîne hemû gelê kurd.

Hozan Mizgîn piştî xebatên hunerî yên li Ewropayê di demên herî dijwar de ji bo rêxistinkirina jinên kurd berê xwe dide bakurê Kurdistanê navçeya Tetwanê. Mizgîna di demên herî zehmet de berê xwe dide Tetwanê, bi sekn û têkoşîna xwe bandoreke mezin ,di serî de li jinan û hemû gelê Tetwanê dike. Bi Mizgînê re jin û gelê Tetwanê dest bi lêgerîna nasnameyê dikin. Rêxistinkirina Mizgînê li Tetwanê gelek baş bû, wisa ku ger pêwîst bikira ji bo xwe bigihîne jinên navçeyê, çarşefa reş li xwe dikir û wisa diçû ba jinan.

**Bi sekna xwe bû mînak**

Mizgîn jineke gelek bi dîsîplîn û jêhatî bû. Herkes ji sekn û têkoşîna wê bandor dibû. Mizgîn bi sekn û xebatên xwe ne tenê li Tetwanê li hemû Serhedê guhertin pêk dianî. Hemû jinên Serhedê jê bandor dibûn û pê re li Tetwanê serdemeke nû dest pê kiribû.

**Çeka herî mezin stranên wê bûn**

Çeka herî mezin a Hozan Mizgînê deng û stranên wê bû. Bi stranên xwe moral û hêz dida gel. Mizgînê bi sekn û kesayeta xwe, nîşanî hemû gel û jinên Tetwan û Serhedê da ku jin dikarin bi her awayî têkoşîna azadiyê bidin. Jin dikarin deng û stranên xwe bikin çeka herî bi bandor û xwe bigihînin hemû beşên civakê.

Jixwe Mizgîn bi deng, stran û têkoşîna xwe bû parçeyek ji civaka Tetwanê. Êdî gel Mizgîn wek jineke Tetwanê dihesiband û êdî bibû Mizgîna Tetwanê. Jixwe di roja me ya îro de jî dema navê Hozan Mizgînê tê gotin ango stranên wê tên guhdarîkirin yekser Tetwan tê bîra gelê kurd.

**Mizgîniya rojên azad**

Hozan Mizgîn a ku bi deng xwe reng dida têkoşîna azadiyê û bi stranên xwe dibû çem û di dilê gelê kurd de diherikî, di 11'ê Gulana 1992'yan de di şerekî de heta dawiyê li ber xwe dide û bi çalakiyeke fedaî şehîd dikeve.

Lê belê piştî şehadeta Hozan Mizgînê ji bo jinan serdemeke nû ya têkoşînê dest pê kir. Di serî de jinên Tetwanên ku ji sekn û dengê wê bandor bibûn, navê Mizgînê li xwe kirin û tev li têkoşîna azadiya jinan bûn. Piştî çûyîna Mizgînê navê zarokên dihatin dinê dibûn Mizgîn û dibûn mizgîniya rojên azad.

**Bû mêvana dilan**

Êdî deng û lehengiya Hozan Mizgînê di têkoşîna jinan û stranan de dihat jiyîn. Êdî çeka herî mezin a Mizgînê ku deng û stranên wê bûn, dibûn çeka jinên nûgihandî. Êdî Mizgîn -wekî ku Hozan Serhed jî di strana xwe de dibêje- bû Mizgîna leheng û çeleng. Êdî Mizgîn jî bibû stran û wek stranên xwe di nav gelê kurd û jinan de bibû nav û deng. Êdî deng û rengê Mizgînê di stranan de bibû xwedî ruh. Ew êdî bi rêya stranan dibû mêvana dilan. Dilên bi stranên wê coş dibûn û xwe nas dikirin.

Niha di roja me ya îro de jî bi dehan jinên ciwan li ser rêya Hozan Mizgînê xwe digihînin û bi deng û stranên xwe tev li têkoşîna azadiya jinan dibin. Ew jî dixwazin wek Hozan Mizgînê bi stranên wê bibin mêvanê dilê gelê xwe.

Zehra Mohammedzadeh

# Serîrakirina peyvan!..

Li rojhilatê Kurdistanê helbestnivîsîn xwedî kevneşopiyeke pir kevn e. Dengê helbestên kurdî; bi zaravayên cuda, di her çaxekê de û ruxmê zext, qedexe û derfetên pir kêm ên çapê jî bi awayekî xwe gihandiye çar aliyên welat û gelek caran jî sînorên heyî derbas kiriye. Ev deng bi şêweyekê bûye bilêvkirina hestên jinên kurd û kariye bi van peyvan li dijî qeyd û bendên heyî serî rabike.

Nemaze helbesta kurdî li rojhilatê welêt wek kevneşopiyek a ne pêkan e dest jê bê berdan li çiya û deştên welat olan daye. Gelek caran bûye deng û rengê serîrakirina li dijî zilm û zorê, ranewestiyaye û her carekê wek aveke zelal rê û rêçik ji xwe re dîtiye. Belku vê yekê hişt ku di demeke kin de helbesta kurdî bi awayek pêtî bi pêş bikeve û bandorek erênî li ser helbest, çîrok, zargotin û romannivîsiya jinên îranî jî bike.

Mixabin hizr û feraseta nêr a pergala serdest a zilam bandoreke neyînî li ser çanda civakan jî kiriye Gelek caran dest avêtine vê qadê jî û hewl dane peyvan di qirika jinan de bifetisînin û nehêlin ev peyv azad biherikin, zînde û herikbar bin. Lê jinan rê nedaye vê yekê û peyv ne di sînga xwe de, ne jî di nav çar dîwarên mala jê re pêşan kiribûn, fetisand. Bi awayekî li dijî serdestî û pergala nêr, serîrakirina peyvan didin destpêkirin. Ev jî ji bo jinên kurd şerê herî mezin ê di qada wêjeyê de bû. Ev şerê li dijî her cure zextan serkeftinê misoger dike.

Di dîrokên cuda de gelek helbestvanên jin ên mohra xwe li serdemekê dane derketine û karine bi deng û rengên xwe, nemaze di qada helbestnivîsiyê de rê nîşanî jinan bidin. Her çend helbestên gelek ji wan jinan heya roja me ya îro nehatine, yan jî pir kêm behsa wan û helbestên wan bê kirin jî, pergala mêr û serweriya wî tu caran nehiştiye dengê jinê bi awayekî gur û geş biherike; her tim wek siyekê bi ser jinê de xwar bûye. Lê li ruxmê wê jî, jinên helbestvanên wek Dayê Tewrêzî Hewramî ( ya wek yekem jina helbestvan a kurd jî tê pejirandin), Fatime Xanim, Celale Xanim( a di serdema hikûmeta Dîlmiyan û di qirna 10'emîn de jiyaye), Şaxiveşîn, Xatûn Mîzred û Daye Xezan di qirna 13'mîn de jiyane. Mirov nikare bandora van jinan a li ser helbestvaniya jinên rojhilat jinedîtî ve bê. Dîsan Mestûre Erdelanî dîroknas, lêkolînvan û helbestvanek jêhatî ya serdema xwe bûye. Helbet li vir mirov nikare jina helbestvan, Cîhan Ara Paweyî, Nazdar Xatûna Şirazî (sedsala 13'emîn) Semen Xanim a li Erdelanê di sedsala 16'emîn de jiyaye, ji bîr bike.

Helbet gelek jinên li ser rê û rêça van jinan meşiyane û her carekê jî deriyekî nû ber bi helbestên kurdî ve vekirine, hebûne. Lê ez ê xasma behsa Jîla Huseynî bikim. Jîla Huseynî yek ji wan jinan e ku deriyekî nû li ber helbestên nûjen ên kurdî vekiriye. Ew bi taybetî bi helbestên xwe yên li ser jinan, yên bi navê "Geşeyî evîn" û "Qelay raz" rengek nû dide helbest û wêjeya kurdî. Ew bi awayekî herî wêrek, bêtirs û zelal dest davêje helbestan û balê dikişîne ser rewşa jinan.



Jîla Huseynî di sala 1964'an de, li bajarê Seqiza rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Jîla di temenê xwe yê 15 salî de dest bi helbestnivîsînê dike. Jîla tevî keça xwe, di encama qezayek maşînê de, di 32 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dide. Ew endam û damezînera 'Encûmena Wêjeyî ya Mewlewî' li bajarê Sine bû. Di helbestên Jîla Huseynî de hewldanek rewşenbîrî, femînîstî, evîn û dengê jinan derdikve pêş. Wê tevahî emrê xwe di rêya raman û lêkolînê de derbas kir. Jixwe van aliyên wê û pênûsa wê ya bisihr hîşt evçend bihêz peyvan li ser rûpelên sipî yên lênûsa xwe xîz bike.

Helbestvan di nav aheng û hêzeke mezin a xeyalan de ber bi peyvan diherike, ji hêla dewlemendiya hestê de bêqisûr e:

*Dilê tengê min Sêtareke*
*Dema tiliyên evîna te*
*Davên keziyên wê dilivînît*
*Ha li wî demî, bîrhatinên westiyanê dilerizin*
*Ji xeman avis dibin û*
*Bi hemû dengê xwe helbestek nû vedihînît (Werger: Şorê Mayî)*

Di helbesta "Mîwandarî" de wê wiha rêzikan birêse:

*Stêtarekê û sih sitran û sê perên helbestek evîndarî*
*Hevdû nas kirin, bon hevalên can bicanî…*
*Jixwe re jorek girtin*
*Di wê jorê de jî mêvandariya çiya û*
*Hizir û camê mey dikir*
*Bi şev heta sibê wî destê wê digivaşt* ***(Werger: Şorê Mayî)***

Helbestên Jîla civakî bûn, wê di helbestên xwe de bal dikêşand ser rewşa jinê û pirsgirêkên wê, tenêtî û nêzikatiya civakê a li hember jinê, nexasim di mijara kar, zewac û hwd. de dîsa rewşa kambax a malî bû ku bixwe jî di rewşek nebaş de bû. Jixwe Jîla di gelek helbestên xwe de qala rewş û jiyana xwe dike. Ew di helbestên xwe de bi awayekî cihê, dilşikestî û baldar li ser safî û tenêtiya jinê radiweste, li dijî vê rewşê serî radike, bi reng û awayê xwe nêz dibe. Ji hêla şêweya helbestan de mirov dikare helbestên Jîla nêzî helbestên Forox Feroxzad bibîne; şêweya nivîsandin û perspektîfa wan a di mijara serpêhatiya jinê de wek hev in. Belku di helbestên xwe de li pey dengê xwe yê enderûn çûye û di her rêzek ji helbestan de li xwe geriyaye.

Jîla derd û kederên gelê xwe, komkujiyên bi serê wan de derbas bûne jî baş rawe kiriye û aniye ziman: Di van cure helbestên wê de jî mirov dikare dijrabûna wê bi awayekî herî zelal bibîne. Ew vê dijrabûn û kerba xwe di serê her rêzikek ji helbestên xwe de pir baş dihone.

*Dîsan mute bikenî*
*Ser û çavên hîviyên gula dişot*
*Carek din destê xwe yê reşê kimiyayî*
*Bi ser û çavên çiya de anî xwar*
*Carek din tar û mar û qir bo bişkurîn* ***(Werger: Şorê Mayî)***

Jîla stêrkeke geş bû li asîmanê welêt diçuriskî. Wê di temenekî ciwan de gelek kar û xebat di rêya wêjeya kurdî de kir, gelek berhemên biqîmet ên wek Geşey Evîn (Helbest, 1995), Qelay Raz (Helbest, 1998), helbestên berhevkirî yên zarokan ên nehatibûn çap kirin û hwd. li pey xwe hiştin.

# Li nêzî polîsan û cihê niftekirî

Di nav hefteyê de li Amedê ciwanê bi navê Dewran Dînç bi îşkenceyê hat kuştin û cenazeyê wî piştî kuştina wî 4 rojan şûnde bi qasî 10 metreyan dûrî nuqteya polîsan û cihekî miftekrî hat dîtin. Di kuştina Dînç de pirs û guman hene

Qedrî Esen

Li Tirkiyeyê, ji 1980'yî ve bi hezaran kes ji aliyê hêzên dewletê yên tarî ve hatine kuştin û kujerên wan derneketine holê. Ev qiyameta kuştinê di salên 1990'an de derket asta herî jor. Rojane bi dehan kes li kuçe û kolanan bêsûc û bêqebehet dihatin kuştin. Bêguman ev qiyamet li bajarên kurdan bû û rojane mirin diket para kurdan. Ne tenê li bajarên kurdan li bajarên cuda yên Tirkiyeyê jî ev qiyamet hebû. Lê ji bo kurdan tu ferq tunebû. Lewre tenê erdnîgarî diguherî yên dihatin kuştin dîsa piraniya wan kurd bûn.

Bi kurdan re hin kesên demokrat û xwedî wijdan jî dibûn qurbana guleyên xwedî (nas)nenas. Hê jî birînên ku van guleyên li dilê dayik û bavan vekirine, rehet nebûne. Ewqas sal derbas bûn û li ser gelek nîqaş jî hatin kirin lê ew mêjiyê ku dilê dayik û bavên kurd dax dike neguheriye. Ev mêjî di van rojên vîrûsa koronayê de jî li ser kar e û li xaka kurdan di nav tevgerê de ye. Di nav hefteyê de ciwanê bi navê Dewran Dînç ê ku gelekî ji sûrên Amedê hez dikir û hê 21 salî bû, li cihê gelek jê hez dikir, leqayî vî mêjiyê gemarî yê ku mirovên kurd ji xwe re dike qurban hat.

**Kuştin ne qedexe ye!**

Dewran Dînç, di 30'yê nîsanê de ji bo derman ji kalê xwe re bibe ji malê dertê. Dewran, piştî ku derman ji kalê xwe re dibe, li gel ku pîrika wî dixwaze jê re xwarinê çêbike jî, li mala wan namîne û diçe ser Sûrên Amedê ku gelek ji wan hez dikir. Ev roj, di heman demê de roja destpêkirina qedexeya derketina derve ya qaşo ji bo parastina mirovan a ji mirina vîrusa koronayê bû. Balkêş e, ji bo ku mirov bi vîrusê nemirin qedexe hebû lê ji bo bi îşkence û derpkirinê neyên kuştin tunebû.

Heta saetên qedexe dest pê dike jî deng ji Dewran nayê. Melûme ji ber ku ji kurdan re windakirin û kuştin timik li peyasê ye piştî destpêkirina qedexeyê malbat dikeve nav fikaran û dertê lêgerîna Dewran. Ji ber ku guman dike kurê wî di destê polîsan de ye, heta 4 rojan bavê Dewran qereqol bi qereqol digere û pirsa Dewran ji polisan dike. Lê ji ber ku Dewran ji roja destpêka windabûna xwe ve bi îşkenceyê hatiye kuştin, ji polîsan tu bersiveke erênî ku dilê wî xweş bike nagire.

**Pirs û gumanên tên kirin**

Dewran, roja winda dibe bi çend metreyan dûrî nuqteya kontrolê ya polîsan bi îşkenceyê tê kuştin û cenazeyê wî di nav Sûran de li cihekî miftekirî tê veşartin. Lê li gel hemû pirsîn û serlêdanên malbatê jî cenazeyê Dewran ê bi çend metreyan dûrî polîsan ji aliyê polîsan ve nayê dîtin. Ev jî dibe sedema pirs û gumanan. Tê gumankirin ku Dewran ji aliyê polîsan ve bi îşkenceyê hatiye kuştin. Dîtina cenaze ya li cihê miftekirî jî vê gumanê xurt dike. Lewre cihên Sûrê yên miftekirî ji aliyê polîsan ve hatine miftekirin.

Di rewşên wiha de dema malbat ji bo xizmên xwe serlêdana windabûnê dikin, polîs yekser dikevin nav lêgerînê û hemû derfetên di destê xwe de bi kart tînin. Gelo ji ber ku Dewran ji aliyê wan ve hatiye îşkencekirin, bavê Dewran qereqol bi qereqol gerandine? Heke wiha nebe çima serlêdanên bavê Dewran ên ji bo lêgerînê li wî zivirandine û li Dewran negeriyane? Temenê Dewran kirine hincet û lê negeriyane. Gelo polîsên Amedê tenê dema zarok winda dibin lêgerînan dikin? Mifteyên cihê Miftekirî yên sûrê ji bilî polîsan bi kesên din re hene? Heke tunebin cenazeyê Dewran çawa kirine cihê miftekirî?

**Ken û bîranîn man**

Lê li gel van pirs û gumanan jî ji aliyê rayedarên dewletê ve têkildarî kuştina Dewran tu daxuyanî nehat dayîn. Biryar hat dayîn ku encamên otopsiya Dewran jî heta 2 mehan bê dayîn. Ev yek jî nîşan dide ku wê kuştina Dewran jî bikin nav kuştinên kujerên wan nayên zanîn. Bi vê encamê weke bi hezaran dayik û bavên kurd, ji dayik û bavê Dewran re jî tenê rûyê wî yê bi ken û bîranînên wî yên bi tembûr û muzîk man.

# Mirina Gokçek rastiya dewletê raxist ber çavan

Navenda Nûçeyan

Endamê Grûp Yorûmê Îbrahîm Gokçek ê ku 323 rojan di rojiya mirinê de ma û di 5'ê Gulanê de navber da çalakiya xwe, di 7'ê Gulanê de li nexweşxaneya ku lê dihat tedawîkirin, jiyana xwe ji dest da. Berî Gokçek endama komê Helîn Bolek ku ew jî bi Gokçek re di rojiya mirinê de bû, di 3'yê nîsanê de di roja 288'an a çalakiya xwe de jiyana xwe ji dest dabû.

Îbrahîm Gokçek û Helîn Bolek jî di nav de 7 Endamên Grûp Yorûmê, di meha mijdara 2016'an de li Navenda Çandê ya Îdîlê hatibûn binçavkirin. Piştre bi sûcdariya "Ji polisan re derxistina astengiyê, biçûkxistin û endamtiya rêxistinê" hatibûn girtin. Endamên komê Îbrahîm Gokçek, Helîn Bolek, Bahar Kûrt, Bariş Yuksel û Alî Araci, di 17'ê gulana 2019'an de li girtîgehê bi daxuyaniyekê ragihandin ku bi daxwaza bidawîbûna zextên li ser xwe, serdegirtinên li ser Navenda Çandê ya Îdîlê û qedexeyên qonserên xwe dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger kiribûn.

**Bi wezaretê bawer nebûn**

Helîn Bolek, Bahar Kûrt, di 20'ê mijdara 2019'an de hatin berdan û çalakiya xwe ya greva birçîbûnê berdewam kirin. Îbrahîm Gokçek, di roja 201'emîn a çalakiya xwe de li Girtîgeha Hejmara 1 a Silîvriyê ragihand ku çalakiya xwe wergerandiye rojiya mirinê. Gokçek, di 24'ê Sibatê de liser rapora Saziya Tipa Edlî (ATK) ku nikare li girtîgehê bimîne hat berdan. Gokçek jî mîna Helîn Bolek piştî berdana xwe jî çalakiya xwe domand.

Ji bo ku daxwazên endamên Grûp Yorûmê bi cih werin, beriya mirina Helîn Bolekê bi çend rojan, heyeteke ku ji parastvanên mafên mirovan û hiqûqnasan pêk dihat, bi Wezareta Karên Hundir re hevdîtin kir. Heyetê ji wezaretê daxwaz kir ku bêyî bedel bê dayîn daxwazên endamên Grûp Yorûmê bi cih bînin. Lê wezaretê şert da pêşiya heyetê û diyar kir ku heke dev ji çalakiya xwe berdin dê daxwazên wan binirxînin. Endamên komê bertek nîşanî vî şertî dabûn û diyar kiribûn ku ew bi dewlet û wezarete bawer nabin.

**Bavê Gokçek binçav kirin**

Piştî hevdîtinê bi çend rojan Helîn Bolekê jiyana xwe ji dest dabû û gelek bang û hevdîtin hatibûn kirin ku Gokçek jî mîna Bolekê jiyana xwe ji dest nede. Piştî van bang û hevdîtinan di 5'ê gulanê de Gokçek navber dabû çalakiya xwe û li nexweşxaneyeke Stenbolê dest bi tedawiya wî hatibû kirin. Lê ji ber ku 323 rojan di çalakiyê de mabû rewşa wî gelekî giran bû. Di 7'ê nîsanê de Gokçek êdî hew tehemûl kir û piştî serkeftina çalakiya xwe jiyana xwe ji dest da.

Biryar hat dayîn ku ji bo Gokçek li Cemxaneya Gaziyê merasîmek bê lidarxistin û ji bo definkirinê cenazeyê wî biçe Kayseriyê. Roja ku Gokçek jiyana xwe ji dest da li Cemxaneya Gaziyê bi beşdarbûna bi hezaran kesî merasîmek hat lidarxistin. Lê roja din dema ku ji bo oxirkirina cenaze gel li Cemxaneya Gaziyê li hev kom bû, polîsan bi ava şid û guleyên plastîk êrîşî gel kir. Polîsan bi awayekî tund êrîş pêk anîn û derî û paceyên cemxaneyê tev şikandin. Her wiha deriyê morgê jî şikandin û cenazeyê Gokçek revandin.

**Nîjadperest dîsa li ser kar bûn**

Polîsan bi êrîşê re bavê Gokçek Ahmet Gokçek û parêzer jî di nav de gelek kes jî binçav kirin. Polîsan, piştî cenaze revandin careke din neda malbatê û birin heta Kayseriyê. Li Kayseriyê jî bi hinceta qedexeyê destûr nedan ku gelek kes tevlî merasîma cenazeyê Gokçek bibin. Piştî ku hevjîna Gokçek Sûltan Gokçek ji girtîgehê anîn û hevjînê xwe dît cenazeyê Gokçek li Goristana Helebê hat definkirin. Li ser goristanê jî polîsan hin kesên ku xwestin stran bibêjin û biaxivin derp kirin.

Li navçeya Başakpinarê komeke nîjadperest li hev kom bû û bertek nîşanî anîna cenazeyê Gokçek a Kayseriyê dan. Koma nîjadperest nexwest ku cenazeyê Gokçek li Kayseriyê bê veşartin û gotin ku cenaze bê veşartin jî dê cenaze ji gorê derxin û agir berî bidinê. Li gel qedexeya derketina derve jî Parlamenterê MHP'ê Mûstafa Bakî Ersoy û Serokê Teşkîlata MHP'ê Serkan Toprak jî tevlî koma nîjadperst bûn. Parlamenter Ersoy ji komê re axaftinek kir û bi gotina, 'çi ji destê me bê em ê bikin' gef xwar.

## Êrîşa li dijî Cemxaneyê polîtîk e

HDP'ê û bi dehan sazî û rêxistinen elewiyan têkildarî êrîşa polîsan a li dijî Mala Cemê ya Gaziyê daxuyanî dan û bi awayekî tund bertek nîşanî êrîşê dan. HDP'ê erîş şermezar kir û xwest ku lêborîn ji malbata Gokçek û elewiyan bê xwestin û der barê kesên fermana êrîşê dane de lêpirsîn bê destpêkirin. Sazî û rêxistinên elewiyan jî êrîş şermezar kir û destnîşan kirin ku ji bo elewiyan malên cemê cihê pîroz in û gotin êrîşa li dijî Mala Cemê ya Gaziyê polîtîk e

## DOZA GELEKÎ TÊK NAÇE HEKE REWŞENBÎRÊN WAN TÊK NEÇIN

# Ziman nasnameya berhemê ye

→ Rizoyê Xerzî

*Xwînerên hêja di vê hejmarê de em yek ji nivîkarên pêşî yên rojavayê Kurdistanê ku beriya salên 90'î di warê nivîsandina kurteçîrokê de dihat naskirin, dikin mêvanê xwe. Kerem bikin em bi hev re nivîkarê kurd Pîr Rustem nas bikin.*



***Di destpêkê de em bi hev re vegerin salên beriya 90'î ku wê demê me li zanîngeha Helebê hev nas kir. wekî tê bîra min di destpêkê de te bi çîrokên erebî dest bi nivîsandinê kir û paşê tu derbasî kurdî bûyî, tu dikarî ji xwendevanên me re behsa wê demê bikî, ango çima bi erebî û çi bû sedem tu li kurdî vegerî?***

Belê, vaye sîh sal qediya di ser wan rojan re, lê ez bawer im; me karibû şopek li pey xwe bihişta, çi di warê edebiyatê de be û çi jî di cureyên din de be . Ji bo ronîkirina wan deman em dikarin bêjin ku guhdana me ya bi çand û edebiyatê vedigere salên li pêş wan deman, lê hema tenê weke mirovekî ji xwendinê hez bike û ne weke yekî dixwaze bibe nivîskar. Heya salên dawiya 80'yî ku em wê hingê li Zanîngeha Helebê bûn weke we anî ziman û dê çîrokeke evînê bihêle ez hinek hestên xwe bînim ziman di şêweya çîrokê de. Helbet bi zimanê erebî ji ber ku xwendina fermî li dibistanê bû û zimanê me qedexe bû, me nedikarî pê binivîsanda weke her mirovekî kurd ku zimanê dayikê jê re tenê yê axaftinê ye. Lê piştî demekê û bi alîkariya hin hevalan û bi taybetî Koma Xanî ya çand û kultura kurdî ku ew di wê hingê de li bajarê Helebê bi roleke girîng rabû û helbet hinek guhdan ji aliyê min ve jî hişt ku ez di demek kurt de fêrî nivîsandina kurdî bibim û wilo min dev ji nivîsandina erebî berda û berhemên xwe bi zimanê dayîkê nivîsandin. Belkî ez yek ji kesên pêşî bûm ku li rojavayê Kurdistanê -qonaxa duyemîn û piştî qonaxa Bedirxaniyan- ku min bi zimanê kurdî çîrok nivîsandiye.

***Di wan salan de baş tê bîra min tevgereke gelekî xurt a çandî di nav xwendevanên kurd ê Zanîngeha Helebê de hebû li gorî te sedemên wê yekê çi bûn?***

Di baweriya min de; ne tenê tevgera çand û edebiyatê xurt bû, tevî rastiya ewê yekê, lê berî wê jî, xurtbûnek di tevgera siyasî de jî çêbûbû û partiyên kurd di Zanîngeha Helebê de roleke girîng dilîstin. Ji ber jimarek xwendevanên me ya baş çêbûbû û tevgera siyasî ya kurd xwe digihand wan xwendevanan; ango em dikarin bibêjin, weke qonaxeke ronakbîriyê bû di civaka me ya Rojava de. Ev guhdana tevgerê bi ev nifşê xwendevan hişt tevgera rewşenbîriyê di vê qonaxê de careke din bi rê bikeve. Piştî demeke dirêj ji vemirandinê, ji ber weke em dizanin li bajarê Şamê paytexta Sûriyê û di salên 30 û 40'î de û li ser destên Mîr Celadet û hin hevalên wî, tevgereke xurt dihate meşandin, lê mixabin piştî derketina fransiyan ji Sûriyê, miletê me kete bin zora şovînîzma ereb û gelek destkeftinên xwe winda kirin. Berî her tiştî yên çand û edebiyatê û evê qonaxê dirêj kir heya bi salên 80'yî û bi şûnda, ku hinekî tevgera siyasî ya kurd xurt bûbû, piştî hinekî ji ewan kotekiyên rêjîma Baasa şovîn xelas bûbû. Ji ber ewê hingê rêjîma Sûriyê bi kirîza (Ixwan Mislimîn) de ketibû û hinekî darê zorê ser pişta miletê me sistbûbû û ewê yekê hiştibû tevgera siyasî hinekî bi rola xwe rabe ku weke we got, tevgereke rewşenbîriyê derkeve holê.

***Em bala xwe didin berhemên te yên dawî piraniya wan lêkolîn û gotarên siyasî ne û bi zimanê erebî hatine nivîsandin, çima ne bi kurdî ne?***

Mixabin û piştî çar berhemên çîrokê, romanekê û hinek berhemên dîtir di warê siyaset û lêkolînê de ku tev bi zimanê zikmakî hatin belavkirin, min dev ji zimanê kurdî berda û ez hatim nivîsandina bi zimanê erebî. Di warê siyasetê de weke we anî ziman û ev çîrok jî vedigere destpêka sedsala nuh ku hinekî rola kurdan ya siyasî berz dibû û bi taybetî rola Herêma Kurdistan ku di wan salan de hatina navbenda neteweyî bû li herêmê û weke ji kurdan re xêzek danîbûn û ewê yekê hiştibû ku jimareke mezin ji rewşenbîrên ereb ên şoven şerê Kurdan û herêmê bikin -weke çawa nuha şerê Rêveberiya Xweser tê kirin- ev yeka çûye hişt ku ez guhdaneke mezin bidim bersivdana wan pênûsên şoven û diviyabû bi zimanê erebî be. Ji ber nivîsandina wan a mak bi erebiye û xwendevanên xwe dê kesên bi erebî dixwîne be û wilo pirtûka min a pêşîn bi zimanê erebî di bin navê (القضية الكردية في الخطاب العربي المعاصر) de hat. Ango (Doza kurdî di guftûgoya erebî ya nuh de) û weke em ji navnîşana pirtûkê dibînin ew deq bêtir ji xwendevanên zimanê erebî re ye.

***Gelek kurd hene bi zimanên din berhemên xwe dinvîsin, gelo ew berhem dibin malê kurdan an jî xizmeteke çawa ji bo çand û zimanê kurdî dike?***

Evê babetê di demekê de –û belkî heya niha jî- çarçoveke mezin di diyaloga rewşenbîrên kurd de cih girt. Hinekan ji me got, ew nivîsandinên ji aliyê nivîskarên kurd ve tê nivîsîn, tenê babetên wan bi kurdan ve girêdayî be, ew ji çanda kurdî tête jimartin, bêyî ku li zimanê wê binêrin. Di bawerî û dîtina min de ew nêrîna çûyî hinekî bi hestê neteweyî hatî ser ziman û ne bi xwendineke hişmendî. Ango ewên ji bilî zimanê kurdî dinivîsin û da ku ji wan re neyê gotin, nivîsa we yan ew bi xwe ne weke nivîskarên kurd in, ewana rastiyeke naskirina edebiyatê bincil kiriye, ewa ji ziman tê. Weke em tev dizanin, gava ji me re tê gotin û weke nimûne; edebiyta tirkî, em têdigihên ew edebiyata bi zimanê tirkî hatiye nivîsandin û ne ewa ku nivîskarê wê bi eslê xwe tirk e yan mijara wê li ser tirkan e. Vêca ez bi xwe bi wê dîtinê re me ku dibêje, ziman nasnemeya çand û edebiyatê didê. Lê ew yeka natê wê wateyê ku nivîsandinên bi zimanên dîtir -çi ji aliyê nivîskarên me yên bi esil û nijada xwe kurd in û çi jî yên biyan, ewên mijarên xwe li ser kurdan bin- nakevin raj û xizmeta doz û miletê me, qet na. Helbet ew jî dikeve xizmeta gelê me, lê em nikarin jê re bêjin; ew ji çand û edebiyata kurdî ye, ji ber weke me berê jî got, ziman nasnameya berhema te dide û ne tu weke nivîskarê wê an jî babeta nivîsa te.

***Di demên dawî de me êdî navê te yê rast Mustefa Ehmed ê siyasetmedar û çalakvanê siyasî, ji Pîr Rustemê nivîskar bêtir bihîst, tu ji bo vê yekê çi dibêjî?***

Bi dîtina min, bêtirî sedemek heye hişt ku navê min ê weke di nasnameyê de (Ehmed Mustefa) were belavkirin, li kêleka navê min ji xwe re vebijartibû (Pîr Rustem) . Helbet dema ev nav min ji xwe re vebijart sedemên wê yên awarte hebûn û da ku xwe di pişt de veşêrim, lê piştî rêjîma Sûriyeyê ez naskirim –helbet ew jî piştî demek dirêj di bin navê veşartî de min karên xwe yên siyasî û edebî kiribûn, navê min ê rast hat naskirin- belê piştî ez hatim naskirin nema tu dikarî navê xwe yê rast ji xwendevan veşêrî. Sedema sereke ya derketina navê min ê rast, rûpela min a facebookê bû. Ji ber nivîsandinên min ên siyasî, hiştibû gelek salixdan li ser min ji rêveberiya facebookê re biçin û bihêle ku ew ne navê min e û rûpela min weke rûpeleke bi navekî sexte û derew bişopînin. Vêca ez mecbûr bûm ku ez rûpela xwe li gor navê xwe yê nasnameyê durust bikim û belgenameyekê ji wan re rê bikim da ku rûpela min negirin.

***Em vegerin ser kurteçîrokê ku te di wî warî de gelek berhemên xwe çap kirine û li rewşa wê ya di nav kurdan de binêrin. Li gorî te çima kurteçîrok di nav wêjeya kurdî de kêm maye, an jî tu cihê wê di nav wêjeya kurdî de çawa dibînî?***

Bawer im ne tenê kurteçêrok, hema hemû cureyên edebiyatê cihê xwe hîna baş negirtiye -helbet ji bilî helbestê- û ev yeka bêguman sedemên xwe yên dîrokî hene Ew jî girêdayiye bi dîroka milet û welatê me vaye ku heya niha di bin sitemkariya dijminan de ye û qet derfet neketiye destê miletê me ku nifşên wî bi zimanê xwe bixwînin û ji ber ku çand û kultur bi zimanan tê avakirin û dema zimanê te qedexe be, dê her nivîsandinên te tunebin an jî qelsbin. Ji bo kurd karibin çand û kultura xwe ava bikin û di rewşeke wilo awerte de, ew ber bi helbestê çûn; ji ber ku awaz û ristên helbestê, dihêle ew zû were lezberkirin û ne weke deqa çîrok an romanê ku mirov nikare lezberbike. Lewre em dibînin ku zargotina kurdî yek ji zargotinên herî zengîn e di cîhanê de, ji ber ku miletê me her tiştê xwe bi devkî ji me re hiştiye û weke me got, bi sedema rewşa siyasî ya sitemkar.

***Di vê pêvajoya nazik a ku kurd bi giştî û bi taybetî Rojava tê re derbas dibe û bi man û nemanê re rû bi rû ye, çi bar dikeve ser milê rewşenbîr û nivîskarên kurd?***

Ez tim dibêjim; miletek an dozek têk naçe, eger ku rewşenbîrên wî têk neçûbin. Ango da ku dozek bi ser keve divê berevanên wê xurt bin û helbet berevanê miletan û dozên wan, dê rewşenbîrên wî gelî bin û ji ber wê yekê, yekî weke Gobilz, wezîrê Hîtler dê bibêje: "Herku ez rewşenbîrekî dibînim ez şeşara xwe dimelisînim, an jî misdidim." Lê ka em li rewşa rewşenbîrên kurd binêrin, gelo ew bi rastî di wê astê ya ku berevaniya dozên gelê xwe bikin da ne yan na û nemaze weke we anî ziman di vê pêvajoya nazik de ku dijminên me hemû kar û şêweyan bi rê ve dibin da ku em weke doz û milet bi ser nekevin. Mixabin û sed hezar car mixabin, rewşenbîrê me hîna ji bin kiras û eba partiyetiyê derneketine û her yek ji me bi şûrê partiya xwe şerê birayê xwe dike û ne şerê dijmin. Lewre tevgereke ronakbîriyê bo me piwîst e ku nivîskarê me têbigihên; rola wan ronahiyê ji siyasetmedaran re vêxîne û ne rûreşiyên wan veşêre.

Mixabin û sed hezar car mixabin ku rewşenbîrê me hîna ji bin kiras û eba partiyetiyê derneketine û her yek ji me bi şûrê partiya xwe şerê birayê xwe dike û ne şerê dijmin. Lewre tevgereke ronakbîriyê bo me piwîst e ku nivîskarê me têbigihên; rola wan ronahiyê ji siyasetmedaran re pêxîne û ne rûreşiyên wî veşêre.

**Pîr Rustem kî ye?**

Nivîskar Pîr Rustem di sala 1963'yan de li gundê Şêx Çeqlê yê Efrînê hatiye dinyayê. Di sala 2008'an de derbasî başûrê Kurdistanê bûye û piştî sal û nîvekê ji wir jî koçî Swîsreyê bûye û niha li wir dijî. Heta niha derdora 20 berhemên wî bi zimanê kurdî û erebî hatine çapkirin ku piraniya wan ji kurteçîrok û lêkolînên siyasî pêk tên.

# Eger ziman hebûn be...

Zana Farqînî

Eger bi rastî ziman hebûn û xwebûn be, nexwe em xwe qet bi vir de û wê de nedin, ji xwe re li bihaneyan negerin û karê îro nehêlin sibehê. Ziman nasname ye, xwebûna xwe bi zimanê xwe bidomîne

Dixwazim bi pirskirina çend pirsan dest bi nivîsê bikim. Ji ber ku maka bersivan pirs in; ji lew re heta pirs neyên kirin bersiv jî peyda nabin. Ev pirsên ku em dixwazin bikin jî ev in: Ziman çima tên qedexekirin, gel çima tên asîmilekirin? Tekparêzî û netewedewlet xwedî çi wesfê ne? Têkiliya çand û ziman çi ye? Bera ziman hebûn û xwebûn e?

Qedexekirina zimanan a bi awayê sîstematîk aîdî serdema modern e ku bi avakirina netewedewletan derketiye holê. Gava mirov li ser karakterê netewedewletan disekine, dibîne ku wan tekîtî/monîzm ji xwe re wek bingeh hilbijartiye û ew li dijî pirzimanî, pirçandîtî, pirbawerî û pirçeşîdiyê ne. Her tişt li ser çand, ziman û nirxên etnîsîteya serdest hatiye organîzekirin û sepandin. Ji bo wan tek ziman, tek çand, tek ala û heta tek dîn an jî mezheb heye. Ji bo gel û neteweyên bindest jî rêyeke tek heye: Pejirandina nasnameya neteweya serwer û xwebexşkirina ji bo dahatûya wê neteweyê. Kesên ji eslên cuda tên divê xwebûna xwe di nav a serdest de bihelînin û dev ji hemû mafên xwe berdin. Ji bo wan divê ne ziman, ne çand, ne welat ne jî gel/neteweyeke din hebe. Êdî neteweya serdest û zimanê fermî/dewletê heye û dem dema zimanê neteweyî ye. Senefinake din jî zimanê herêmî, zimanê hindikahiyan û zimanên qedexekirî ye.

Ji ber ku ziman hilberîner, hilgir û veguhêzerê çandê û pêkhênerê nasname û aîdiyetê ye, ji bo pêkanîna asîmilasyonê diviya ev navgîna karîger ku wek astena herî xurt e, bihata qedexekirin. Ku ziman neyê bikaranîn, bi domana demê re tiştê heyî jî bere bere kêm dibe û ji navê radibe.

Neteweyên serdest bi helandina gelên din a di nav xwe de jî dixwazin xwedêgiravî welat û dewleteke tekreng çêkin û bikin ku dijberên wan ên navxweyî ji wan re nema bibin gelş û kêşe, kelem û serêşî. Bi wê jî namînin bi red û înkarê "yên ne ji xwe" bêesil û kok dihêlin, paşvemayî û hoveber nîşan didin da ew êdî hew xwezî bi xwe û raboriya xwe bînin, berevajî wisan dikin ku ew bibin takekesên ku xweziya xwe bi serwerên xwe bînin da ew bibin kesên şad û bextewer.

Helbet haya pirekî pir a kurdên hişyar ji van sepan û siyasetên hanê heye. Lê di warê hesta zimanî de bi ya min gelek qels in. Bi qasî balê dikêşin ser neheqiyan, zilm û tehdeyan, maf û azadiyan, pirrengî, pirçandî û pirzimaniyê ew çend li ziman û çanda xwe nabin xwedî.

Çîna ronak a civaka me ya Bakur bêhtir dûrî çand û zimanê xwe ye. Ji ber ku zimanê wan ê sereke ne kurdî ye, tirkî ye. Xebatên sosyolenguîst nîşan didin ku asta perwerdeyê ya civaka kurd (ku bi tirkî ye) çi qas bilind dibe rêjeya pişaftinê jî ew qas zêdetir dibe. Nexwende ji xwendeyan bêhtir bi kurdî dizanin û pê dijîn. Wek mînak derçûyên zanîngehan ji lîseyiyan, lîseyî ji yên dibistana navîn û yên heta dibistana navîn xwendine jî ji kesên derçûyên dibistana seretayî zêdetir asîmîle dibin. Ev encamên xebatên sosyolenguîstîk in.

Di destpêka îsal de, ji hêla "Sosyo Politik Saha Araştırmaları Merkezi" (Navenda Lêkolînên Meydanî ya Sosyo Polîtîk) ve li 16 bajarên kurdan hatibû kirin. Li gorî rapora rapirsiya vê navendê, ji beşdaran % 69.4 diyar kiriye ku li nav malê, %59.4 li kuçeyê bi kurdî û %81.1 diyar kiriye ku li dameziraweyên fermî bi tirkî dibeyivin. Encameke balkêş ya vê rapirsiyê ew e ku rêjeya kesên nexwende yên li nav malê bi kurdî dipeyivin %76.2, lê rêjeya peyivîna kesên xwende jî 61.1 e. Li gorî dahata darayî jî rêjeya axaftina bi kurdî diguhere. Kesên halxweş bêhtir axaftina bi tirkî tercîh dikin. Dîsan kesên li gundan hatine dinyayê li gorî kesên li bajaran hatine dinyayê, bêhtir meyla wan li ser kurdî ye. Her wiha rêjeya axaftina bi kurdî li gorî temen jî diguhere, temen çi qas zêde dibe rêjeya axaftina bi kurdî jî ew qas bêhtir dibe (ji bo kurdî yekûna axêverên kurmancî û kirmanckî bi hev re hatiye dayîn).

Mixabin, di rapirsiyê de pirs ji kesên xwedî temenê 18 salî û berjor hatiye kirin. Lê ev yek jî fikirek bi mirov re çêdike ku bê rewşa axaftina bi kurdî çi ye. Lê esil ya rewşa veguhastina ziman li nifşên dahatûyê diyar dike zarok in. Lê ji van cure xebatan û çavdêriyê mirov dibine ku rêjeya zarokên kurdan ên bi tirkî radibin her diçe zêdetir dibe ku ev yek ji bo dahatûya zimanekî tiştekî diyarker û jiyanî ye.

Hin pîvaneyên UNESCO'yê hene ku bi wan rewşa zimanan tê pîvan bê ka zimanek di xeterê de ye yan na:

•Veguhastina ziman a di navbera nifşan de

•Hejmara kesên bi wî zimanî dipeyivin

•Rêjeya axêverên wî zimanî ya li gorî yekûna nifûsê

•Guherînên li qadên bikaranîna zimên

•Berteka zimên a li qad û nîvengên nû

•Hînbûna zimên; hebûna keresteyên pêwîst a ji bo hînbûna xwendin û nivîsîna bi wî zimanî

•Helwest û polîtîkayên saziyan û dewletan, rewşa fermî ya zimên û bikaranîna wî jî tê de

•Helwesta takekesên civakê ya li hemberî zimanê xwe

•Mîqdar û wesfên belgeyên heyî yên têkildarî zimên.

Gava em di van yekan bifikirin em dê ron û aşkera bibînin ku tabloyeke dilxweşker li ber me nîn e. Rewşa zimanî ya zarokan û kesên temen biçûk dide nîşan ku windabûna zimanî ya di navbera nifşan de çêbûye. Ziman li nifşên dahatûyê nayê veguhastin. Li aliyekî zimanê nivîskî bi pêş dikeve, kanal û organên wê çêdibin, lê li aliyê din zarokên divê ew geşe bi ziman bidin û bidin jiyandin ji dest diçin, dibin berhemên asîmîlasyonê. Nifşeke nav bi kurdî lê ziman bi tirkî radibe.

Rewşa ku ji derveyî îradeya me diqewime em daînin wî alî. Endamên civaka zimanî dikarin çi bikin? Pirsa girîng ev e. Eger bi rastî em xemxurên zimanê xwe bibin divê em gilî û gazinên xwe ji merciyên pêkhêner bikin, rexneyên xwe li partî rêxistin, sazî komele û dam û dezgehên xwe bikin: Ji lew re, ji cihê mirov jê hêvî dike gazinên xwe jê dike. Ew qas xemsarî bes e, divê zimanê têkoşîna mirov jî bi zimanê mirov be. Divê ziman di hemû qadên jiyanê de bê bikaranîn û li nifşên nû jî bê veguhastin.

Eger bi rastî ziman hebûn û xwebûn be, nexwe em xwe qet bi vir de û wê de nedin, ji xwe re li bihaneyan negerin û karê îro nehêlin sibehê. Ziman çand e, nasname ye, hebûn e. Xwebûna xwe bi zimanê xwe bidomîne.

Cejna zimanê kurdî li me hemûyan pîroz be û bila xemxuriya me jî bi rojekê yan jî bi çend rojan tenê nemîne û her berdewam be.

Ramazan Olçen

## Bidestxistina mafê navdanînê!

*"Ez hurmet û rêzdariya xwe; bi ramanên baş, bi gotinên baş, bi karên baş… nîşan didim û hemû ramanên nebaş, gotinên nebaş û karên nebaş red dikim."*
*Yasna 11/17 – Zend Avesta*

Di sala 1932'yan de serê meha dawîn a biharê di 15'ê Gulanê de Celadet Elî Bedirxan li sirgûniyê bi navê Hawarê kovareke bi kurdî derxist. Ev roj îro di nav kurdan de weke cejn-mîhrîcan tê pîrozkirin. Li gorî min ji gotina cejnê zêdetir biwarê lê hatinê; gotina mîhrîcanê zêdetir wê li bejna vê rojê were. Di nav gelên aryen de Mîthra temsîla rojê û rastiyê dike; bilindbûna rojê û ronîkirina devrûberê jî reş û spî eşkere dike. Ji ber vê sedemê Hawar jî weke bilindbûna wê rojê ji wê demê ve ye rêya me ronî dike.

Em çiqas zarokê rojê ne ewqas jî zarokê Hawarê ne yanî. Ji ber vî qasî ev rêûresm çawa ku bi bihîstina mewij devê mirovî şîrîn bibe; bi dîtina peyva mîhrîcanê jî tîrêjên rojê li plazmaya çavî dikevin û keskeseroke piştî baranên nîsanê li pêş çavî çêdibe. Yan jî dibe ku ev bi min wisa tê. Lê zanistê jî îro roj derxistiye holê ku ji alfabeya mixî heta bi hiyeroglîfan, heta bi alfabeyên roja îro beridîna tîpan jî weke beridîna civakan e. Ew tîp beriya ku bigihîjin roja me ji ebat û qiyasa xwe giran û mezintir wateyan hilgirtine.

Weke mînak moriyan bînin ber çavên xwe. Bi dehan qat giraniya bedena xwe dikarin bar hilgirin. Tîpên tên gel hev û dibin peyv û di nav demê de bi isûl li pey hev jî rêz dibin û dibin hevok. Dibin mala gotinan. Dibin civat! Îcar çi civateke bi bandor e ku mirov dema wan dibihîzin ji halan dikevin halan; Kêfxweş dibin, xemgîn dibin, hêrs dibin, ji mil û max dikevin, dimirin, dijîn…

Va ye Hawara Celadetî jî qîrîneke ji berî zemanan e! Dema navê wê dibihîzim bi min re gelek hestên cihê çêdibin. Hawar di gelek zimanan de hema bêje wateya xwe heman e; bi nefes û mecala dawîn bang-qîrîna ji bo xelasbûna ji wê rewşa tengezar. Celadet bi Hawarê bi hawarê ve diçe. Hawarê dike mala kurdî. Li zimanekî bifikirin ku ji dema împaratoriya Asûran tê xwestin ku kok lê were qelandin; xwe bi saya Hawarê ji ariyên xwe weke ji qîrîn û Hawara xwe; xwe diafirîne.

Îcar te dî, di pirtûkên pîroz de der barê qîmeta gotinê, baş û xweş axaftinê de gelek ferman hene. Di wan de qise û çîrok hene. Pirtûka Zerdeşt dibêje; ramana baş, GOTINA baş, karê baş. Pirtûka Mûsa dibêje; berê GOTIN hebû! Pirtûka Mûhammed dibêje; BIXWÎNE! Di pirtûk û sihûfan de Xwedê bi rêya ziman bi evdên xwe re têkilî datîne, bi wan re diaxive. Di navbera afrîner û afrîdeyê de diyalog heye. Wisa ji hev fêm dikin. Zanist dibêje 150 hezar sal in, mirov bi hev re bi awayekî tekûz diaxivin. Helbet 150 hezar sal beriya 150 hezar salên axaftina tekûz jî axaftin hebûye. Fermanî bûye. Were û here!

Hasilî heke em li dema baweriyan vegerin, gotin hêzê dide xwediyê xwe. Kurdî qedexe kirine. Bi qedexeyê re hêzê ji me dizîne. Wan nehîştiye em nave li karik û berxikên xwe jî bikin. Îcar Hawar wê hêzê li me vegerandiye. Em bi Hawarê re bi hêza xwe hesiyane. Îro roj jî bi vê Hawara mala kurdî ji mafê me ye em behsa azadiyê bikin, ji mafê me ye ku em gilî û gazincên xwe ji hev bikin, ji mafê me ye ku em ji bo xwedî li GOTIN'ê derkevin yek bin.

# Sembola gelê xwe

Gelek helbestvan û stranbêjan qala qehremaniya Leyla Qasim kiriye û li ser wê helbest û kilam nivîsîne. Şêrko Bêkes, Tîrêj û gelek helbestvanên ereb yên mîna Udunîs di helbestên xwe de qala canfedayiya Leyla kirine

Xunav Elban

Leyla Qasim, jineke leheng û şervan bû. Ji kurdan jina yekem, li dinyayê jî jina çaremîn e ku bûye esîra siyasî û bi mirinê hatiye tewanbarkiri. Di dîroka jina kurd de û ya Kurdistanê de cihekî wê yê awarte heye. Bi kurtasî mirov dikare bêje, Leyla Qasim sembola têkoşîna rizgariya jinan a neteweya kurd e.

Leyla Qasim di sala 1952'an de li Xaneqînê tê dinê. Leyla keça Dalaho Qasim û Kanî ye. Ji rêza sêyemîn xwişka çar birayan e. Navên birayên wê, Sebîh, Selam, Sefa û Selah in. Di çarsaliya xwe de, koçî Hewlêrê dikin. Bavê wê rêncberiyê dike ew jî bi diya xwe re diçe di bostanan de dixebite. Zimanê erebî di dibistana seretayî de hîn dibe. Piştî dibistana amedehiyê diqedîne bavê wê li gor rewşa xwe ya feqîr û tengezar jî dixwaze keça wî bixwîne û bibe xwedî pîşeyek.

Di sala 1971'î de li Zanîngeha Baxdayê dest bi perwerdeya civaknasiyê dike. Di demeke kurt de li vir dibe endameke çalakvan a Yekitiya Xwendekarên Kurdistanê (YXK). Leyla li ser pirsgirêka kurdan û li ser mafê jinan pir disekine, ji ber vê yekê pir bandor li xwendavanên zanîngehê dike.

Layla Qasim û malbata wê geşedanên li Kurdistanê ji nêz ve dişopînin. Di emrê xwe yê ciwan de biryar dide ku gelê kurd, ji ber dijwarî û esareta rejima Baasê rizgar bike û ji bo Kurdistaneke serbixwe têbikoşe.

Leyla di şanzdehsaliya xwe de bi birayê xwe re ji bo zilm û zordariya rejima Baasê ya li ser kurdan şermezar bikin, belavokan dinivîsin û belav dikin. Leyla hêdî hêdî li derdora xwe dibe wek model û bi kiryarên xwe cesaret dide xortan, nameze jî dide keçên kurdan, da ku di têkoşîna siyaseta kurdan de cih bigirin.

Leyla di sala 1970'î de dibe endama Partiya Demokarat a Kurdistanê (PDK), di wê demê de di navbera Seddam Huseyîn û Mele Mistefa Barzanî de peymana xweseriya Kurdistanê tê çêkirin. Li gor peymanê dê Hewlêr bibûya paytext. Dê di navenda hikûmeta Iraqê de 5 wekilên kurd bihatana hilbijartin. Dê zimanê kurdî bibûya zimanê fermî yê duyemîn. Dê ji dibistana seretayî û heya zanîngehê perwede bi seranser bi kurdî bûya û dê geşedana çap û weşanên kurdî pêk bihatina. Lê ji ber hinek dewlet rê li ber digirin, peyman cihê xwe nagire û her diçe êrîşên girantir li kurdan dikin. Her roj bi dehan ciwanên kurd qetil dikin û bi hezaran kesan ji gundên wan derdixînin.

Di wê navberê de Leyla Qasim di hemû qadên siyaseta kurdî de hespê xwe diajo. Leyla û hevalên xwe doza Kurdistaneke serbixwe dikin û îdia dikin, heya kurd nebin xwedî dewleteke serbixwe, dê tu caran nekarin ji bin esareta mêtingeran xelas bibin.

Leyla Qasıim di domana xebatên xwe yên siyasî de rastî xortekî ê bi navê Cewad Hemewendî tê û di navbera wan de evîneke xurt dide der. Evîna wan a duyemîn jî Kurdistaneke serbixwe ye. (Ji bo vê evînê, herdu jî tên darvekirin)

Leyla Qasim û hevalên xwe biryar didin ku ev zilm û zordariya li ser kurdan tê kirin, bi çalakiyên cuda cuda hawar û gaziyên kurdan ragihînin dinyayê. Bi vê armancê, 24'ê mijdara sala1974'an de ji balafirgeha Bexdayê balafirekê direvînin. Bes bi ser nakevin. Leyla bi hevalên xwe yê bi navên Nerîman Fuad, Hesen Heme, Reşid Azad Silêman Miran û destgirtiyê xwe Cewad Hemewendî re ji aliyê rejima Baasê ve tên girtin. Îşkenceyên pir giran li wan tên kirin û piştre 12'ê Gulana 1974'an de tên darvekirin.

Leyla Qasim di dema darizandinê de ji dadger re wiha dibêje: "Min bikujin lê vê rastiyê jî bizanin ku bi kuştina min dê bi hezaran kurd şiyar bibin. Min ji bo azadiya Kurdistanê canê xwe feda kir, ez ji vê yekê serbilind im." Û gava diçe ser sêdarê jî sirûda "Ey Reqîb" dixwîne.

Vê gavê li başûrê Kurdistanê çend akademiyên jinan bi navê Leyla Qasim hatine vekirin, çend peykerên bîranînê ji bo wê hatine çêkirin, çend pirtukên lêkolînê li ser jiyan û têkoşîna wê hatiye nivîsandin, çend konferans û kongre ji bo bîranîna wê hatiye darxistin.

Gelek helbestvan û stranbêjan qala qehremaniya Leylayê kiriye û li ser wê helbest û kilam nivîsîne. Şêrko Bêkes, Tîrêj û gelek helbestvanên ereb yên mîna Udunîs di helbestên xwe de qala canfedayiya Leyla Qasim kirine. Tê gotin hinek helbestvanên filistînî jî behsa qehremaniya Leylayê kirine.

Her wiha, hunermendên kurd li her çar perçeyên Kurdistanê bi stran û awazên xwe canfedayiya Leylayê bi bîr tînin.

Hunermendên navdar Şehrîbana Kurdî, Ciwan Haco, Bengîn, Heme Ceza û M. Mamlê helbestên helbestnavnên kurd ku der heqê Leylayê da vehûnandine bi awazên xweş stirandine.

Seyda Hêmin Mûkriyanî helbestvanê neteweyî yê çaxê (bi soranî) li ser qehremaniya Leylayê wiha dibêje:

*Ke to toray le çawim wek xewî min*
*Le biskit reştire mangeşewî min*
*Biro Mecnûn be Leylay xot menaze*
*Ke nawbangî pitir derkird ewî min*
*Bizey hatê, witî celadî xiwêrî!*
*Be keyfî xot petit bawêje estom*
*Ewe pet niye mîdalî îftixare*
*Ke bûme qaremanî mîlletî xom.*

Her wiha, Seydayê Cegerxwîn jî di helbestên xwe de bi xembarî li ser şehîdbûna Leylayê wiha dibêje:

*Leyla keça Mît û Meda*
*Canê xwe da di ber me da*
*Bijîn heçî ko canfîda*
*Xweş bin ji te jar û geda*

*Leyla çiraxa şevreş e*
*Wê rû li kurdan kir geş e*
*Kuştin bi me kurdan xweş e*

*Zordarî êdî nameşe!*
*Leyla bijî, sed aferîn*
*Ji bo me bûye ol û dîn*
*Dîsa li min der bûn birîn*
*Heta ciger min bûye xwîn!*

## Leyla

*Şêr şêr e, mêr e yan jin e*
*Nîşan bi destê Leyla min e*
*Pola ye dil, wek asin e*
*Leyla çî ye? Leyla jin e*
*Leyla kî ye? Leyla min e*
*Leyla min e, Leyla welêt*
*Wê dil li min kir ar û pêt*
*Mizgîn li Kurd roja me têt*
*Dijmin ji tirsan maye şêt*
*Leyla çî ye? Leyla jin e*
*Leyla kî ye? Leyla min e*
*Leyla keça Mîd û Med e*
*Canê xwe da di ber me de*
*Bijîn heçî ku canfîda*
*Xweş bin ji te jar û geda*
*Leyla çî ye? Leyla jin e*
*Leyla kî ye? Leyla min e*
*Divêm li pey te bêm ez jî*
*Çib'kim bi vê jîna rijî*
*Xwînê nerijî nabijî*
*Leyla bijî, Leyla bijî*
*Leyla çî ye? Leyla jin e*
*Leyla kî ye? Leyla min e*

## Xweşkanî

Felemez Ulug

## Huner û hunermend

Di her civakê de hunermend xwedî nirxekî pir hêja û bi nirx in. Tişta hunermend bi nirx dike jî hunera wî/ê ye. Hunermendên xwe mîna evîndarê huner û kedkarên çandê didin nasîn, di nav civakê de jî bi rêzdarî tên naskirin. Lewma mirov dikare bêje bi qasî huner, şopa hunermend li pey xwe dihê jî pir girîng e.

Di nav civaka kurd de jî gelek kesên bi evîndariyeke mezin vê xizmeta çanda kurd kirine hene. Ev kes ji helbesta bigirin heya stranan, ji şanoyê bigrin heya filman û hwd. di vê oxirê de bûne xwedî kedek pir mezin. Bêguman ji ber ev kes evîndariya çanda gelekî bindest kirine û ji bo vê çandê bidin xwedîkirin ango bidin jiyîn gelek bedelên mezin jî dane. Di dîroka Kurdistanê de mirov li şopa van kesên pir hêja gelek cara rast tê.

Dewletên dagirkeriya Kurdistanê dikin beriya her tiştî xwestin civaka kurd ji çanda wê dûr bixin. Lewma bi hemû amûrên şerê taybet ve û di her qada civakê xwestin çanda kurd biçûk bixin. Li ruxmî hemû êrîşên dewletên dagirker ên li ser çanda kurd tê meşandin, di roja me ya îro de mirov dikare bêje asta çand û hunera gelê kurd bi dest xistiye di asteke hêjaye de ye.

Di van salên dawî de gelek kesên ji rastiya çanda kurd pir dûr û bi her awayî ve di bin tesîra çanda postmodern de peyda bûne. Ev kesên ji nirxên civakê dûr ji ber nezanî û kêm perwerdeyî bi awayekî pir şaş çanda heyî jî qirêj dikin.

Gelek stranên gelerî û dengbêjî yên hêja ji ber nebesiya van kesan ve hatine xirakin û bêqîmetkirin. Di nav civaka kurd de hunermendî êdî bûye amûrek. Gelek hunermend îro derdikevin strana dibêjin nikarin heqê vê çanda resen bidin. Lewma gotinên stranên gelerî tên guhertin.

Beriya her tiştî pêwîst e hunermend bi tu awayî xwe ji civakê cuda neke. Lê mixabin beşek hunermendên me xwe ji civakê û rastiyên çanda kurd dûr xistine. Beriya her tiştî pêwîst e hunermend afirîner be. Xwedî berhem be. Lê mixabin gelek kesên qaşo ji xwe re dibêjin hunermend heya niha berhemek neafirandine û her tim li ser keda hin kesên cuda xwe dane jiyîn. Hunermendên ne afirîner û ne xwedî berhem be wê rojek were di nav rûpelên dîrokê de bê jibîrkin û biçe.

Ji ber van pirsgirêkên heyî pêwîst e di nav saziyên çandê de an jî di nav civata hunermendan de pênaseya hunermendiyê ji nû ve bê kirin. Li gor min ew kesên derdikevin ser dikê û li ser keda hin kesên din xwe didin jiyîn ne hunermend in. Mirov dikare ji wan re bêje stranbêj lê hunermendî pênaseyeke pir cuda ye.

Ji kesên hunerê diafirînin re hunermend tê gotin. Ji kesên di nav civakê de pêşengiya hunerê dikin re mirov dikare bêje hunermend. Ji kesên serpêhayên civakê vediguherînin hunerê mirov dikare bêje hunermend. Mirov ji kesên li çanda xwe ya neteweyî xwedî derdikevin û wê di platformên cuda de pêşkêş dikin re dibêje hunermend.

Di her civakê de pênaseya huner û hunermend pir hêja ye. Bi taybetî di nav civakên bindest de ji ber ku kedkariya hunerê pir zehmet û ewqas jî pir hêja ye. Ya girîng ew e ku çi dibe bila bibe pêwîst e em bi nirxekî mezin li çanda xwe û kedkarên wê xwedî derkevin. Em nehêlin ev çanda resen bibe amûrekî destê nezanan.

## Pandemiya koronayê

*Dr. Mehmet Demîr**

Pandemî, nexweşiya mîkrobîk e ku berê tunebû yan jî nedihate nasîn. Belavbûna nexweşiyê ya ji mirovan bo mirov di demeke kin de herî kêm li du parzemînan an jî li çend devletan pêk were bi navê pandemî tê pênasekirin. Pênaskirin û aşkerakirina wê jî ji hêla Rexistina Tendurustî ya Cîhanê ve tê kirin.

Di dîrokê de ji grîba rûsan a 1889'an heta îro 10 pandemî (zekem) çebûne. Ya herî bi bandor di salên 1918-1919'an de vîrusa H1N1 e ku weka zekema spanî tê pênasekirin. Di wê zekemê de 50 milyon mirovan canê xwe ji dest dabû.

Îro jî mirovahî bi vîrusa Covid-19'ê re rûbirû ye ku weke zekema çînê tê penasekirin. Covid-19 her çiqas bandorê li hemû kesan bike jî bêtir bandor li mirovên temenê wan li ser 50'î re dike. Her wiha bandorê li yên nexweşiyên wan ên demdirêj û mayinde hene û yên parastina wan a xwezayî qels e dike.

Vîrusa koronayê bi taybetî di bedena cureyekî çila de ku li herêmeke Çînê dijî. Li gor gumanan dibêjin ji wî cureyê çila derbasî mirovan bûye. Bi gelemperî vîrusên sewalan ên ku bandorake xeter li mirov dikin û nexweşiyên giran li mirov çêdikin ji sewalan derbasî mirov nabin.

Vîrus di dev û poz re bi dan û standina nefesê re, bi temasa destê ku em temasî mirovên nexweş û tiştê ku wan temas kiriye dikin û berî dezenfektekirinê destê xwe bidin poz û devê xwe vîrus derbasî mirovan dibe.

Zêdebûna vîrusê di bedena mirov de di navbera 2-14 rojan de pêk tê. Dema derbasbûna wê ne diyar e. Ên vîrusê digirin ji sedî 80'yê wan beyî ku delêletê nîşan bidin derbas dikin. Ên delêletê nîşan didin jî ji sedî 90'ê wan germahiya laşê wan bilind dibe, ji sedî 75'ê wan bi kuxikê dikevin, ji sedî 50'yê wan nefesa wan diçike û hinek ji wan jî bi êşa qirikê dikevin û emelî dibin.

Beşa virûs derbasî kezeba wan a spî dibe nexweşî li wan giran dibe û dibin weke elema (pnomonî). Beşek ji vana nexweşî li wan gelek girandibe û canê xwe ji dest didin.

Rêjeyeke gelek kêm jî weke sorbûn, hestirbûn, nepixandina, tebeqaya ser çav (konjoktîva) tê xuyakirin.

Tesbîtkirina vîrusê bi testa PCR'ê tê kirin. Heke encam erênî (pozîtîf) be, yan delêletê nexweşiyê yên klînîk û yan jî tomografiya pişikê ku erênî be weke nexweşiya koronayê tê pejirandin.

Her çiqas rêjeya derbasbûna nexweşiya koronayê ya ji mirov li gorî nexweşiyên 20 salên dawîn ên vîrusê zekemê yên weke SARS û MERS'ê zêde be jî rêjaya mirinê li gorî wan kêm e. Weke tedawiya hemû nexweşîyan tedawiya vîrusa koronayê jî septomatîk e. Legerînên ilmî yên ji bo parzayê (aşî) û peydakirina dermanên tedawiyê berdewam dikin.

***Hevserokê Şaredariya Êlihê**

# Vîrus li malê ye!

Navenda Nûçeyan

**Ji bo xweparastina li dijî vîrûsê her tim bangewaziyên "Li malê jiyan xweş e û li malê bimînin" hatin kirin, lê belê dengê jinên ku li malê hatin kuştin û bi şîdetê re rûbirû man nehat bihistin. Jin bi kujer û êrîşkaran re rûbirû hatin hiştin**

Li gorî daneyên dawî heta niha li tevahiya cîhanê nêzî 4 milyon kes bi vîrusa koronayê (Covid-19) ketine û nêzî 300 hezar kesan jî canê xwe ji dest dane. Ji destpêkê heta îro di der barê mijarê de gelek nirxandin û şîrove hatin kirin. Pêvajo ji nêz ve hat şopandin. Bandora vîrusê ya li ser dewlet û civakê, siyaset û aboriyê, xweza û mirovahiyê bi her awayî di vê pêvajoyê de hat şîrovekirin.

Ne tenê qadek hemû qadên jiyanê ji vîrusê bi bandor bûn. Di pêvajoya vîrusê de jiyan ne wekî berê ye û gelek tişt guherîn. Di nav civakê de tirs û di nav dewletan de jî fikara aboriyê zêdetir li pêş e. Di pêvajoya vîrusê de jî cudakariya di nav civakê de derket asta herî jor. Kesên li malê dixebitin, kesên ji neçarî di karên bingehîn de dixebitin, kesên bêkar û bêdahat man û kesên hatin jibîrkirin.

**Krîza aboriyê**

Ligel kesên li malê bi rêya internetê karê xwe yên rojane didomînin li gorî kesên din bi şans bûn. Kesên di qadên tenduristiyê, înşaatê, kargehên xwarin û vexwarinê, cotkariyê, paqijiyê, xwedîkirina pîr û kalan, dermanfiroşî, ajokariyê de dixebitin di vê pêvajoyê de jî bê ewlehî dixebitin. Gelek kesên karê bazirganiya perakende dikirin, di restoran û mexazayan de dixebitin ji kar hatin dûrxistin an jî derxistin destûra bêpere. Ev kes di vê pêvajoyê de bêsîgorte û bêdahat man. Her wiha kesên hatin jibîrkirin jî hebûn; wekî girtî, penaber, karkerên demsalê, kesên bêmal, malên xwedîkirina pîr û zarokan. Ev kes bêtir bi vîrusê re rûbirû man.

**Newekhevî û cudakarî**

Li dijî belavbûna vîrusê tedbîrên dewletan çend hatibin sistkirin jî hêj di meriyetê de ne. Tedbîrên di serî de hatin girtin, di tevahiya jiyanê de bû sedema guhertinan. Tedbîr hatin wergirtin û guherînên pêk hatin bêtir li jinan bandor kir. Jinên di jiyana rojane de bi zext û zordariya pergala serdest re ribûrû diman, bi girtina tedbîran re bêtir bi zor û zehmetiyan re rûbirû man. Di vê pêvajoya ev qas xeternak de newekhevî û cudakariya li hemberî jinan zêdetir bû.

**Bi mirinê re rûbirû man**

Dema kargeh û fabrîqe hatin girtin di serî de jin ji kar hatin dûrxistin û derxistin destûra bêpere. Wekî her tim di vê pêvajoyê de jî bi xebata û heqdestê hindik hatin xebitandin. Jinên li derve dixebitin bi her awayî bi mirinê re rûbirû hatin hiştin. Jinên di qada tenduristî, paqijî, kargo,depo û kargehên xwarin û vexwarinê û hwd. de dixebitin, destûra wan a heftane ji ber zêdebûna kar hat betalkirin, gelek caran heqdestê wan nehatin dayîn û an jî bi hinceta krîza aborî heye heqdest kêm hatin dayîn. Ji bo jinên dixebitin kel û pelên parastinê yên wekî lepîk, maske û tulim nehatin dayîn, an jî kêm hatin dayîn. Dema jinan bertek nîşan dan jî bi derxistina ji kar hatin tehdîtkirin.

**Bêdeng man**

Li cîhanê bi milyonan jin niha li malên xwe karê xwe didomînin. Ev tişt bû sedem ku jin di nav rojê de hem bi karê xwe re û hem jî bi karê malê re mijûl bibin. Xebata jinan ya li malê berpirsiyariya jinan zêde kir û jinan hewl da ku hemû pêwîstiyên malbatê bi cih bînin. Ji bo karê xwe yên derve winda nekin jin bêdeng man.

**Bêparastin man**

Her wiha bangewaziyên wekî "Jiyan li malê xweş e", "Ji malê dernekevin" û "Li malê xwe biparêzin", "Ji bo rojên xweş li malê bin", "Li dijî vîrusê li malê bin" û "Ji bo hezkiriyên xwe li malê bin" hatin kirin. Bi girtina tedbîran re bi milyonan kesan xwe ji civakê îzole kir. Hişmendiya tu caran keda jinan ya li malê dihat dayîn nedidît, di dema vîrusê de jî li malan serdest bû. Li dora jinan dîwar hatin danîn û bê deng û bê parastin hatin hiştin.

**'Jiyan li malê xweş e!'**

Şîdet û kuştina jinan di pêvajoya îzlasyonê de zêdetir bû. Çawa ku her roj daneyên vîrusê zêdetir dibin, daneyên şîdeta li hemberî jinan û kuştina jinan jî her roj zêde dibe. Di vê pêvajoyê de li Çînê şîdeta li hemberî jinan 3 qat, li Fransa û Amerîkayê ji sedî 30 zêde bû. Her wiha li Îngilîstanê ji sedî 65'ê jinan ji ber şîdetê gilî kirin. Li Danîmarkayê hejmara jinên ku serî li stargehan dane zêde bû û asta şîdeta li Spanyayê jî zêdetir bû. Li Tirkiyeyê jî di nav 2 mehan de 68 jin hatin kuştin. Her wiha li Tirkiyeyê ji ber qanûna înfazê bi hezaran kujer, êrîşkar û tecawizkar serbest hatin berdan. Li şûna ku hemû dewlet li dijî kuştin û şîdeta li hemberî jinan tedbîr bigirin, jin bêparastin hiştin û di ser de jî gotin "Jiyan li malê xweş e!"

## Divê jin ji xizmetên tenduristiyê sûdê bigirin

Nûnerên jin ên Konfedarasyona Sendîkayên Karkerên Şoreşger (DÎSK), Konfederasyona Sendîkayên Kedkarên Cemaweriyê (KESK), Yekitiya Odeyên Avahîsaz û Endezyarên Tirk (TMMOB) û Yekitiya Bijîşkên Tirk (TTB) bi daxuyaniyeke hevpar bal kişandin ser xizmetên tenduristiyê û gotin di vê pêvajoyê de jin nikarin sûdê ji xizmetên tendirustiyê werbigirin.

Jinan destnîşan kir ku di têkoşîna li dijî pandemiyê de xebatkarên tenduristiyê li pêş in û ji sedî 70 xebatkar jî jin in. Di daxuyaniya hevpar a jinan de wiha hat gotin: "Her çend hejmara xebatkarên jin zêde bin jî jin dema xizmetgirtinê de bi pirsgirêkan re rûbirû dimînin. Ji bilî nexweşiyên fizîkî û derûnî divê jin bi rihetî xwe bigihînin xizmetên plansaziya malbatê, ducanîbûn, çavdêriya berî û piştî welidandinê, pêvajoya menopozê. Divê mafê kurtajê neyê sûîstîmalkirin, kurtajên bi derengî di çarçoveya lênihêrîna lezgîn de were nirxandin û hebên jiberçûnê ya ducanibûnê jî divê bi reçeteyan werin standin."

## Ji bo girtîgehan planeke lezgîn hewce ye

Desthilata AKP-MHP'ê bi hinceta vîrusa koronayê qanûna înfazê ya tenê mafê girtiyên edlî diparêze derxist û zêdeyî 100 hezar girtiyên edlî serbest tên berdan. Lê girtiyên siyasî û nexweş li girtîgehan bi mirinê re rûbirû hatin hiştin. Rêxistinên demokratîk û sivîl ku di nav de komele, ode, sendîka û partiyên siyasî jî hene, daxuyaniyeke hevpar dan û xwestin girtiyên metirsî li ser tendursitî û jiyana wan heye bi lez serbest bên berdan.

Di daxuyaniya hevpar de wiha hat gotin: "Li gorî tê xwestin paqijî nayê kirin, malzemeyên paqijiyê û dezenfekteyê nayê dayîn, girtiyan dernaxin revîrê û nabin nexweşxaneyê û tedbîrên li dijî vîrusa koronayê nayên girtin û ev rîska wan a bi ketina şewbê zêdetir dike". Sazî û rêxistinan xwest bi lezgînî ji bo girtiyên siyasî û nexweş ku di bin rîskê de ne planek bê amadekirin. Daxuyaniyên wezareta dadê têr nakin. Li girtîgehan çend kes bi şewbê ketine û rewşa wan çi ye nayên gotin.

Di daxuyaniyê de daxwaz wiha tên rêzkirin: "Divê ji bo hemû girtîgehên li Tirkiyeyê pêkanînên parastin û pêşîlêgirtinê bên kirin û ev pêkanîn ji kontrolê re vekirîbin. Girtiyên darizandina wan didome û cezayê wan teqez nebûye û di asta temyîz-îstînafê de ne demildest bên berdan. Di vê pêvajoyê de revîr û sewqên nexweşxaneyan ên hatibûn rakirin careke din bikevin meriyetê. Cezayê girtiyên nexweşên giran û nexweşên kronîk ên ku nikarin bi tena serê xwe jiyana xwe bidomîmin bên taloqkirin û bên berdan. Divê ji bo berdana girtiyên nexweşîyên wan hene şertê rapora Saziya Tiba Edlî (ATK) bê rakirin û raporên nexweşxaneyên perwerde û lêkolînê û zanîngehan jî bên qebûlkirin."

# Li mala Rewşen Bedir-Xan

Em gelekî destteng bûbûn. Ji ber vê yekê rehmetî rabû zeviyên hevalekî xwe bi nîvî çand, kire pembo. Ji ber kêmbûna avê, wî dest bi kolandina bîrekê kir û navê bîra xwe jî kir "Bîra Qederê". Wî bîra xwe bi destê xwe kola

**Firat Cewerî**

Piştî rêwîtiyeke dirêj, ez ber destê êvarê, li Banyasê, ji otobusê peya bûm. Banyas bajarekî xweş e, yek ji bajarên Sûriyê yê herî xweş e. Bajar li kêleka deryayê hatiye avakirin. Bi awira pêşî piraniya şêniyên bajêr dewlemend dixuyên. Dibe jî mirov dewlemendiya wan di lixwekirin û otomobîlên wan de dibîne. Her çiqas şêniyên bajêr ereb jî bin, dîsan mirov peyayên bi kefî û egal û jinên sernuxumandî kêm dibîne. Li vî bajarê Sûriyê yê nûjen, xanimeke kurd dima. Keça Salih Begê, dotmam û kevaniya Celadet Begê… Kaxeza navnîşana vê Xatûna han di destê min de bû û yên ku ez pêrgî wan dibûm, min navnîşana wê ji wan dipirsî. Gotineke pêşiyên me heye, dibêje "Mirov bi pirsê diçe Xursê". Ez jî bi pirsê gihîştim ber avahiyekê, hevekî li ber deriyê avahiyê rawestiyam û min hêdî û bi heyecan li derî da. Ya ku ji min re derî vekir berdestka wê bû. Jinikê bi tirkiyeke osmanî, lê bi devoka çerkezan bixêrhatinî da min, çenteyê min ji destê min girt û ez birim odeya rûniştinê, ba Rewşen Xanimê. Rewşen Xanimê jî bi mêvanperweriyeke kurdî û bi rûyekî bi ken bixêrhatinî da min û ez bi cih kirim.

Ez jî bi dilşahî rûniştim. Piştî kurtesohbetekê min çavên xwe li resimên li dîwêr gerandin. Resimên pêşî li ber çavên min ketin, resimên hersê birayan; Sureya, Celadet û Kamûran Bedir-Xan bûn.

Piştî şîva êvarê min ji Rewşen Xanimê pirsî:

***Gelo tu yê bikaribî bi niyeta kurtehevpeyvînekê xwe bidî naskirin?***

Ez keça Salih Bedir-Xan û jina Celadet Alî Bedir-Xan im, got û jê pê ve tu tişt negot.

Ji xwe bes e jî. Kurdên navên Salih û Celadet Bedir-Xan nebihîstibin pir kêm in. An jî kurdên xwende û bîrewer yên haya wan ji Celadet Bedir-Xan û xebatên wî tunebin, çi bigire nîn in.

***– Ê baş e, xebat û xwendina Rewşen Xanimê bi xwe çi ye û çi bû?***

– Weke kar, min mamostetiya zimanê erebî dikir û ez demekê jî midûrê dibistanê bûm. Erebiya min ji kurdî û tirkiya min çêtir bû û çêtir e jî. Ji ber vê yekê xebatên min yên rewşenbîrî jî bêtir bi zimanê erebî dibû. Min bêtir bi erebî dinivîsand û ji zimanên din werdigerande erebî. Min pirtûkek jî bi navê "Hin rûpel ji edebiyata kurdî" bi erebî, berpêşî xwendevanên ereb kiriye. Min carina jî hin bend di Hawarê de belav dikirin.

Gava ew bi kurdî dipeyivî wê hin zehmetî dikişand, ew carina di nav re bi min re bi tirkî dipeyivî; bi tirkiyeke pir xweş û bê kêmasî…

– Niha jî ez vê pirtûka han werdigerînim erebî. (Pirtûkek li ser Siltan Evdilhemîd bû).

***– Ji bo çi ev pirtûk û ne yeka din?***

– Weşanxaneyekê ev ji min xwestiye, bêtir vê bala wan kişandiye. Tu ya rastî bixwazî, bi wergerandina vê pirtûkê çend quruş pere jî digihîjin min.

Bivê nevê sohbeta me carina diçû dema rehmetiyê Celadet Beg û kovara Hawarê.

***– Yadê, tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtî behsa dema Hawarê bikî? Hawar li ku û çawan derdiket, yên zîrek ku tê de kar dikirin kî bûn?***

– Çapxaneya Hawarê li malê bû. Yek ji mijûliyên rehmetî yê sereke derxistina Hawarê bû. Min jî alîkariya wî dikir. Piştî demekê, gava ez hînî rêzkirin û ambalajê bûm, kar hêsantir bû. Hingî Osman Sebrî û Qedrî Can jî li ba me diman, herdu jî pir jêhatî bûn. Dûre Îbrahîm hebû, ew bi rastî jî rewşenbîr bû. Osman Sebrî çar mehan li cem me mabû, hîn jî min nizanîbû ew Osman Sebrî ye. Wan Osman Sebrî, bi Hecî Husên bi min dabûn naskirin.

***– Hin kes dibêjin kovara Hawarê bi alîkariya fransizan derdiket, ma rast e?***

– Na, ne rast e. Hawar ne bi alîkariya fransizan, lê bi destûra wan derdiket. Ne bi tenê Hawar, her wisa Roja Nû jî bi destûra wan derdiket.

***– Heke îro fransiz li vir bûna, wê rewşa kurdan çawan bûya?***

– Wê rewşa kurdan her wilo bûya. Fransiz jî kolonyalîst in û yên em îro di bin destên wan de ne jî kolonyalîst in.

***– Ma rast e ku armanca Celadet Beg avakirina Kurdistaneke monarşî bû?***

– Kî vê bibêjin ew bêbextiyê li rehmetî dikin. Wî tu carî tiştekî wilo negotiye, ne jî daxwaz kiriye. Wî her digot, divê Kurdistan bi destê hemû kurdan bête ava kirin. Çi karker, çi gundî, çi mele, çi axa û beg hemû xwediyê Kurdistanê ne. Armanca rehmetî Kurdistanek demokratîk û yekbûyî bû. Ji xwe Kurdistan yek e. A niha jî hin xort dibêjin em ji Kurdistana Tirkiyê, hin dibêjin em ji Kurdistana Îranê, hin dibêjin em ji Kurdistana Iraqê û hin jî dibêjin em ji Kurdistana Sûriyê ne. Bi ya min ev ne rast e, şaş e. Kurdistan yek e û sînorên li Kurdistanê hatine kişandin ji derveyî îrada kurdan hatine kişandin. Ew sînorên emperyalîzmê ne.

***– Ew Celadetê ku îro ji aliyê hemû kurdan ve tê hezkirin, gelo ji Rewşen Xanimê re çawan bû?***

– Ew ne bi tenê mêrê min, lê ew her tiştê min bû. Ew bavê min, birayê min, hevalê min,mamostayê min bû. Ez jî yek ji wan kurda me ku îro kêmasiya nebûna wî dikişînim.

***– Windabûna vî peyayê bi rûmet çi tesîr li jiyana te kir, ev trajedî çawan çêbû?***

– Mirina wî ez mehû kirim, dinya bi ser min de hilweşand. Mesûliyeteke siyasî, civakî û aborî di stûyê min de hişt. Ji xwe dawîhatina jiyana wî ya bi trajedî jî, ji bo başkirin û hebekî bipêşdexistina aboriya xwe bû. Lê nebû, ew kar bû sedema mirina wî.

***– Çi bû ya ku bû sedema mirina wî?***

– Tacirî, pembo… Em gelekî destteng bûbûn. Ji ber vê yekê rehmetî rabû zeviyên hevalekî xwe bi nîvî çand, kire pembo. Ji ber kêmbûna avê, wî dest bi kolandina bîrekê kir û navê bîra xwe jî kir "Bîra Qederê". Wî bîra xwe bi destê xwe kola.

Piştî van gotinan Rewşen Xanim demekê bêdeng ma, kûr kûr fikirî û cigarek vêxist. Wilo xuya bû ku wê hê jî ew bûyer ji bîr nekiribû. Min jî nexwest ez zêde bi dû sedemên ku çima "wî bîra xwe bi destên xwe kola" bikevim, min gotin dagerand ser tiştekî din:

***– Çi ji xortên kurd yên li Ewrûpayê dikeve serê te? Ew dikarin çi bikin?***

– Ger ew bibin yek, ew dikarin her tiştî bikin. Yekîtî, divê hûn yekîtiyekê di nav xwe de çêbikin. A niha bi dehan kovar û rojname derdikevin, çira? Ma ger hûn werin ba hev û sê-çar kovar û rojnameyên bi kalîte derxin, ne çêtir e?

Heya ku ez li ba wê bûm, wê ji min re got, got û got. Destê min ji vê mirova gotinxweş, zarşêrîn, zana û rewşenbîr nedibû. Di mêvandariyeke kurt de wê ez hînî pir tiştan kirim, dîrokek ji min re got…

***Banyas, 1987***



SAL 1 — YEQŞEMB

HAWAR

HEJMAR 1 — 15 GULAN 1932

Qomela Qurdî * Revue Kurde

Têdeweizliyên Qomelê

Armanc, awayê xebat
û nivîsandina Hawarê
Ji xwendevanan re
Elfabêya Qurdî
Stûna fekehan
Stûna zarowan : buhar
Edebiyata welatî
Hawar hebe, gazî li dû ye
Di dora dinyayê de
Xatirxwaziya Memî
Hevî ji xwendevanan
Ferhengoq

Birê Frensizî

Buts et caractères de la revue Hawar
L'alphabet Kurde
Notices sur la littérature, mœurs et coutumes Kurdes

Çapxana Tereki 1932 — Sam

---

**Sîdar Jîr**

## Vebeyîna "Nexşên Li Giyan"

Hebûn an nebûn, êş, estetîzekirina êşê, meş, windabûn, wêrekî, tunebûna fizîkî û afirandina hebûneke ruhî/giyanî… Nivîsandina nexş û şopên li welatekî, vebeyîna hebûneke giyanî… Romana Dilawer Zeraq a bi navê "Nexşên Li Giyan" berê xwîneran dide ser şopa yên bi birînên xwe hewl dane hebûneke dilzîz li vê xakê biafirînin.

Ne tenê di edebîyatê de, her wiha di hemû qadên jiyanê de nîşaneya masûmîyetê bêguman zarok û zarokatî ye. Romanûs ev yek gelekî xweş zevt kiriye û di beşên pêşîn ên pirtûkê de, gelekî bi zanayî di ser zarokan re mijar vegotîye. Ji henek û yarîyên zarokane ku dirûv dide lîstikên wan ên ku wan zarokan ji bo jiyaneke di nav de winda nebin amade dike. Zarokên li taxa xwe bi henek û laqirdîyan dema xwe diborînin, bi demê re dibin xwedîbiryar, dibin heval û hevrê û ew zarok bi xwe ne yên dibin nexşeke şîrîn û di heman demê de jî dibin bîr û bîranîneke deşt û çîya û li bajaran vedibeye…

Ev roman bi eslê xwe ku mirov ji alîyê civakî ve lê binêre, vebeyîna ruhê hevaltî û hevrêtiyeke mayînde li ber me radixe. Berovajîkirina gelek dijberî û nakokîyên di nav civaka me de di ser wê hevrêtîyê re, bi giyanên wan zarokên ku bûne keç û xortên cengawer û gelekî bi rehetî şop li jiyana civakê hiştine û êdî civakê bi rengekî henûn, dirûvekî nerm vediguhezînin û dibin nexşeke xweş a jiyana me…

Tirsa zarokatîyê ya lîstikan, windakirina lîstikan, rewşên ne bi dilê zarokên vî welatî bi demê re dibe hesteke xurt a hevrêtîyê ya avakirin û veavakirina jiyaneke dîtir ku hebûn û tunebûna wan û civaka wan bi benikekî xav bi hev ve girêdayî ne… Ew ne li gorî dilê civakê be civak giran tê, civak hay ji wan tunebe ew giran tên û ew benik di cih de diqete û her du alî jî têk diçin, winda dibin. Hostetî û konetîya lehengên Dilawer Zeraq di wir de xuya dibe, wekî canbaz û pêlewanan bi liberxwedana veavakirina civakeke xweştir û jiyaneke nûtir wî benikê di navbera xwe û civaka xwe de qehîmtir dikin.

Ya ku wan dikin "Nexşên Li Giyan" jî ew heza û hunera wan a bi lehengî ye. Em di rûpelê 81'ê de (Beşa –"Bîryarî-II") li vê hevokê ras tên; "Di dema xwe avakirinê de, çelengên jiyanê rabûn; û dan dû şopa şop û mesîla ava rabûyî; wan qaqibo li jiyana ku bi dengê tirsê, bi dengê mirinê, xwedî dibû kir; û wan doza bilindayîyê li çiyayan kir."

Dilawer Zeraq, bi hişekî zelal û bi pênûseke hay ji xwe hey, nexşên gelekî şîrîn ên giyanên lehengên bayê, berxikên çiyayên bi qasî sirûdan bilind û ji jiyanê re dibêjin QAQIBO(!) wekî lewheyek ji serdemên dêrîn pêşkêşî xwîneran dike.

Dilopek jî be bi pênûsa Dilawer Zeraq em lê hay dibin ku giyanên zarokên şêrgele yên welatekî bi tirsê hatibû şûştin çawa civakekê ji tirsê dişon û her yek dibe nexşek li dilê zarokên nifşên piştî xwe…

Ma ne edebîyat, bi taybetî jî roman amûreke veavakirina civakê ye? Heger roman bi hişekî zelal û bi bîreke xurt were nivîsandin, bêguman di vî warî de amûreke xurt e.

Meşa di nav romanê de û lêvegerên bi hemdê xwe rê dide me ku em piştî xwendinê xwe têxin şûna Menîce, Arya, Şêrcan, Memo, Sêvdîn, Şîro, Rewşen, Rizgan, Siyabend, Xebat, Zerya û hemû lehengên romanê û pirsyara hebûn, tunebûn û windabûna xwe bikin û derî li welatê êşa xwe vekin.

****Zeraq, Dilawer, Nexşên Li Giyan-Sêyîneya Winda-3, Roman, Weşanên Lîs, 2014***

# Çimeyê heme nêweşîyan kapîtalîzm û dagirkerî yo

Nesrîn Namdar

Aşma Gulane aşma şehîdanê cangorîyan a, aşma dayanê fedakaran a û aşma roşanê ziwanê Kurdan a. Gulane bi raştî zî aşmêka bi gulan a. Heme aşman zêdehîrê xoza bi gul û vilan xemelnena û rîpêşê aye newe ra rengnena. Bi weşkahîya xo ruhê însanan de hîsanê pozîtîfan virazena û bereketa heme ganeyanê rî erdî rê. Însanî na aşme de verê xo danê xoza û pişike înan bi oksîjenêke pak yena degirotişî. Hema vacê her merdim xozaya ke bi gul û vilikan ameya xemelnayîşî ra hes keno/a la zehf tay merdimî qedrê xoza zanê û zehfê merdiman bi qaso ke qedir danê pere û meqamê berzan nîmeyê ey zî nêdanê xozaya ke heme veranê xo bexşê înan kena.

**Kapîtalîzm xoza xerepna**

Her serre însanan bereket û weşkahîya gulane ra nehfêke baş girotêne la qedrê aye nêzanayêne. Çi heyf ke heta çîyêk destê merdimî ra nêvecîyo merdim qedrê ey zî nêzano. Dimayê nê vîrusê korona ke destpêkê zimistanî ra Çîn ra vecîya û temamê dinya de bi vila zehf akerde ame dîtişî ke lazimo zêdeyê peran û meqaman qedir bideyo xoza û heme ganeyanê rî erdî ke Homayî ey zî sebebêke ra xuliqnayo. Ma zanê bi destpêkerdişê pergala kapîtalîste dir zehf zerar dîya xoza û ganeyê bînan ê rîerdî ro. Bi zihnîyet û kerdişanê kapîtalîzmî serre bi serre aşme bi aşme atmosfer zêdetir xerepîya, feleketê hewa û derdorî pêsero nêbî kêmî. Kapîtalîzmî hem qiwet û aqilê însanî hem zî heme çimeyanê xoza rayîrê sermayeyê xo de xerc kerd û helbet bê şik hetkarîya pîle zî pergalê netewedewletan ra girot û hema zî gêno.

**Xetereyê xoza û ekolojî ser**

Ma vînenê nê vîruso ke bi qasê mîsqalêke yo ters visto zerreyê heme însananê rî dinya û çi rengî ra benê wa bibê, çi neteweyî ra benê wa bibê verê înan dîyayo di çîyan; pakîya dest û rî û keye de mendiş. Bi raştî beno ke pakîya dest û rî û keye de mendiş ma nêweşîyêke çorrî ra yan vîrusêk ra bipawo la heta zihnîyet û pergalê kapîtalîst û netewedewletan, zihnîyet û pergalê dagirkeranê ke her gam û saet xo rê heq vînenê bikoyê war û welatanê şarê bînan raşte ra nêrê wedartişî ne xetereyê merdimahî ser ne zî xetereyê xoza û ekolojî ser nêdarênê we.

**Zordestîya xo domnenê**

Bi qaso ke pergalê kapîtalîst û dagirkeran zilm û zordestîya xo merdimahî ser de domnenê û zerar danê xoza ro, vîrus verê kerdişanê înan de çinê yenê hesebnayîşî. Nê wextê ke heme însanî kewtê keyeyanê xo û wazenê xo vîrusê kiştoxî ra bipawê warê Kurdan de mezelî yenê xirakerdiş, şaristanê înan yenê desteserkerdiş û yenê koçberkerdiş, îradeyê înan yeno desteserkerdiş û yenê hepiskerdiş, ziwanê înan yeno qedexekerdiş û bênasname yenê verdayîş, erdnîgarî û tarîxê înan yenî texrîbkerdiş û no heme zilm û zordestîya dagirkeran zî bi destek û paştîya kaptalîzm û netewedewletanê dinya yenî kerdiş.

**To keye de rehet nêverdeno**

Gef û xetereyê vîrusî çiqas merdimî ser de berdewam bikero go serêke di serî berdewam bikero û derbas bibo la gef û xetereyê dagirkeran ne serrêke yo ne di serrî yo ne hîri serrî yo bi seyan serrano ke şarê ma ser de berdewam keno. Ancî merdim eşkeno bi hîjyenê şexsî û keyede mendiş xo vîrusî ra bipawo la pergalê dagirkerî ne to keye de rehet verdeno ne zî teber de. Vano yan ti go pergalê mi, ziwan û kulturê mi rê xizmet bikerê û mi rê koletî bikerê yan zî ti go koçberî, mezel û hepisxane ra hebêke weçînê.

**Milyonan însanî ameyê kiştiş**

Hema vace şeş aşmî yo heme dinya mîyanê tersê vîrusêk de keleyena û bi ya bo qedênayîşê vîrusê korona dir go pirsgirêkêk nêmano la lazim o merdimahî bifikirîyo, hela xetereyê korona merdimahî û pergalê ekolojî rê zêde yo yan ey emperyalîst, kapîtalîst û dagirkeran. Tenê di şeranê ke Rochilato Mîyanênî de hetê dagiker û emperyalîstan ra ameyê viraştişî de bi milyonan însanî ameyê kiştiş, hepiskerdiş û koçberkerdiş.

**Dûmanê febrîqeyanê kapîtalîst**

Nê serranê peyînan de Sûrîye çimanê ma ver da. Nizdê milyonêke însanî bi tûtî, cinî û extiyaran wa ameyê kiştişî û bi milyonan însanan ca û wareyanê xo ra koçber bîyê. Bi atmosfero ke tenê bi dûmanê febrîqeyanê kapîtalîst sermayedaran yeno lîşinkerdişî dinya leze bi leze ver bi germbûnî û bêawî şona.

**Çimeyê heme şer û nêweşîyan**

Wareka rayvistişanê sey tenduristîya dinya, rayedaranê ke hakimê dinyayê û heme însanan hesasîyeto ke hemverê vîrusê korona mojnenê ra hemverê emperyalîst û dagirkeranê şerwaştan û şervetan û cinawirê kapîtalîzmî zî bimojnayne ra. A gamî go bi sehezaran nê bi milyonan însanî kiştiş û koçberkekerdişan ra feletyayne, go xoza pake û dinya nikay ra qat bi qat ciwîyîndarî rê bayne. Ne welatî ameyêne dagirkerdiş, ne şar warê xo ra ameyêne koçberkerdiş, ne şerrî ameyêne meydan ne zî însanî ameyêne kiştiş. Yeno dîtiş ke çimeyê heme şerran, xirabî û nêweşîyan pergalê kapîtalîst, emperyalîst û dagirkeran o. A gamî lazim o têkoşînê însananê heme dinya zî hemverê nê herîrî cinawiran bo.

# Heş, kutik, mîye û Apo Fariz

Turabî Kîşîn

Rojêk mîye û kutike pîya benê embaz. Embazîye kenê. Rojêk qerarê xo danê vanê; “Ma xo rê şime ware.” Wirzenê ra pîya kûnê raye, cêro raya dewe ra ancînê ke şorê ware.

Xêylî raya xo şonê. Na het û o hetê raye biro. Kutike jû baye gêna. Mîye ra vana ke; “Waka mîye to nîya hurdî hurdî raye ra biyancîye şo. Jû baye amê pirnika mi. Ez dima na baye rê şorî. Hela qayt bikerî rê na baya çinayî ya?”

Mîye van;a “Eya bena ma qeyî nêbena.”

Kutike dana raye dima baye şona.

Mîye cî sarê xo kena verê xo û pira pira raye ra ancîna.

Wexto ke kutike şona, pişkê dime ra heşe mîyanê birî ra vecîna êna verê mîye de vindena.

Heşe mîye rê vana; “Waka mîye ti nesîbê min a. Ez to wena.”

Mîye gêrena verê heşe ra vana; “Di varekê min ê vîçikî estê, qarşê mi meke. Varekê mi bê maye manenê, kam şit dano înan, gunekê…”

Heşe vana; “Nê ez to wena.”

Mîye qayt kena ke çare çinî yo. Vana; “Bira heşe henî aseno ke ez vacî çi to de kar nêkeno, çare çinîyo ti mi wena.”

Heşe vana; “Eya, xo rê ne xo nahet de berze ne cî ahet de berze, bê faydîya ez to wena.”

Mîye xo be xo vana; ‘Ez se bikerî se nêkerî destê ney ra xelas bibî. Vengê xo biresnî birayê xo kutikî.”

Heşe ra vana; “O ke ti mi wena, jû waştena mi esta gerê ti a waştena mi bîyara ca.”

Heşe vana; “Çika na waştena to hela vace.”

Mîye vana; “O ke ez mirena. Ez zana vengê to cî weşo, balê mi rê jû kilamê de rindeke pê vengê xoyê zelal û delalî vace. Aye ra dime endi mi wena, se kena bike.”

Heşe vana; “Vengê mi weşo, henî nîyo ma?”

Mîye vana; “Eya wille vengê to zaf weşê mi ra şono.”

Parsûyê Heşe benê pir. Xo be xo vana; “Dêmeg vengê mi weşo. Mîye cî venganê weşan ra zana. Mademo ke pê vengê mi qayîla o wext ez ci rê kilamê vaca aye ra dime cî nûşena ro mîya xo wena.”

Dest erzena kerike, çimanê xo gêna û kena bore bore.

Fendê mîye cî owo ke veng vecîyo wa kutike pê bihesîyo ke mîye tengede de wa bêra xo ciresna.

Tabî wexto ke heşe kena bore bore, kutike vengî hesîyena. Se hesîyena û cade vazdana êna. Vazdana êna hetê mîye û mîye xelesnena.

Heşe pê kortika xo kinena û dana raye şona.

Beno şan heşe kê xo de ro. Kê xo de xo be xo qesî kena. Qesî kena û xo ra qesan vana. Vana; “Kamî to ra va kilaman vace. Pîyê to kilamî vatê ti vana? Axxx kes çînîyo çend terikan bido binê pîzê mi ra.”

Tam o sire de Apo Fariz verê kewerê heşe ra derbaz beno û goştarê vatena heşe beno. Vengê heşe hesîyeno verê kewerî ra jû terikê xo gêno û şono zere. Şono zere çend terikan anceno bine pîzê heşe ra û dano raye raya xo ra şono.

Heşe şaş manena. Eke Apo Fariz ke şono, heşe dima Apê Farizî qayt kena û sarê xo hêjnena vana; “Hela qaytê nî qusirî kerê ha, kes nêtawreno kê xo de qesî cî biko”

***Not: Çime Qemer Erdogan***

# Erê tu nadî çima tu dixeyidî?

Pêxwasekî berê yê Amedê dem û dewran lê geriyabû û rewşa wî gelekî nebaş bû. Di nav xizanî û bêkesiyê de dijiya. Piştî ku hemû derî li ber hatin girtin derketibû serê carekî bilind, berê xwe dabû ezman, çavên xwe girtibû. Mêrik destê xwe ber bi ezman ve bilind kiribû û hêviya wî mabû xwedanê şev û rojê ku bi hewara wî were.

Mêrik ji xwe re lava û dia dikir û wiha digot: "Ya rebî tu delîlê bêdelîlan î, ya rebî tu bikî perê min çêbibe, ez ê ji xwe re xaniyekî bikirim ji kirêya malê xelas bibim; ya rebî tu erebeyekê jî bikî nesîbê min. Ya rebî tu bi elba mezin bi ser min de bibarînî ku êdî ez hewceyî tu kesî nebim."

Di wê navberê de erdhej çêbû. Mêrikê amedî gelekî tirsiya û wiha got: " Xwedêyo qurbana te me tu nadî nadî çima tu xwe dixeydînî. Temam tu xwe dixeydînî îca çima tu min didehfînî ez qurban." Di nav wê tirsê de rabû ser xwe û reviya, di bazdanê de lingê wî şemitî û kete erdê. Êdî yekcar berê xwe dîsa da ezmanan û got ya rebî li min tobe be ku tu caran tiştekî ji kesekî bixwazim.

## XAÇEPIRS



### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

3.Teref, hêl. 5.Welidî, ji ducaniya xwe xelas bû. 7.Kesa/ê pir tê heskirin û mirov çav lê dike. 8.Cînavkek. 9.Evîndara Derwêşê Evdî. 13.Serhişkî. 14.Bersiva erênî. 16.Gotinek di koka xwe de erebî ye tê wateya qurê… 19.Kovareke kurdî ya xêzeromanê. 20.Kurtasiya navê doktor. 21.Cih û war an jî derve. 22.Xebat. 25.Noteyeke muzîkê. 26.Hilm û gulma agir, tîna agir, hilorkirin. 28.Ne teng.

### JI JOR BER BI JÊR

1.Rojnameyeke rojane ya kurdmancî …..welat. 2.Dadwer, heqanî. 3.Sembola rêxistin û welatan. 4.Pêxemberek. 6.Afrînerê erd û ezman, reb. 10.Kesên ne xwenda (gotineke erebî ye). 11.Ardûyê zivistanê ji bo germkirina mirovan. 12.Tayê qalind, ji bo girêdana devê çewalan tê bikaranîn. 15.Danekî rojê. 17.Navekî kurdan. 18.Ruhnik, zelal. 20.Jihev qutbûn, xerîbî. 23.Kok. 24.Zindewerên xelk newêrin navê wan bilêv bikin. 27.Bersiva neyînî.

### Bersiva hefteya borî

# Tirkiya min nîn e

Mirtib li ku derê cihekî xweş hebe, diçin li wê derê konên xwe vedigirin. Wê havînê jî diçin gundê Şahgeldî, li biniya gund konên xwe vedigirin. Demsal havîn e hemî pez û dewarên gundiyan li derve ne. Li her derê orîna dewaran û zirezira keran e. Tu dibêjî qey Şahgeldî bûye metropol. Li her derê qêrîn û qerebalix heye. Şahgeldî ji ber ku cihekî stratejîk e hemî firar û mehkûm xwe li wê digirin û her şev leşker diavêjin ser gund. Wê şevê jî leşker têne gund û rastê konên mirtiban tên. Konên wan bi serê wan de xira dikin. Resûlê mirtib jî ji nav konan direve û diçe ber mala Simayil û bang dike dibêje: "Simayil ji bona xwedê tu werî, leşkeran em qelandin."

Simayil dertê derve û dibêje: "Kuro çi qerebalixa te ye? Vê şevê qey tu dîn bûyî?"

**Resûl:** "Ez di bextê te da me. Zû were leşkeran em wêran kirin." Simayil dibêje niha Resûl tu dibêjî çi, leşkerê çi?"

**Resûl:** "Heyra welahî min tiştekî weha nedîtiye û dibêje nîvê şevê bû min ewqas dît ku qêrîn bi zarokan ket, min got qey çêleka bi ga li me qelibîye. Dîtina ku min dît leşkeran em dorpêç kirine û zar û zêç di bin lingên wan de pelixîn." Û dibêje: "Simayil ez di bextê te da me tu werî welahî em hêrandin van kafirbavên ji hev kafirdavtir."

**Simayil:** "Resûl niha ez ê werim çi bikim?"

**Resûl:** "Were ji wan re bibêje vana mirtib in bila dev ji me berdin."

**Simayil:** "Ma mişka zimanê te xwariye tu çima nabêjî?"

**Resûl:** "Ma tu nizanî ku tirkiya min nîn e? Welahî tirkiya min hebûya ez nedihatim. Lê xwedê jî zane ku nîn e."

**Simayil:** "Vê şevê û tirkî?"

**Resûl:** "Na lo niha tu bi şev bi tirkî nizanî?"

**Simayil:** "Zanim lê nikarim bipeyivim, tarî ye!"

**Resûl:** "Wax li min û li vê bêkeysiyê. Welahî hetanê ku bibe sibeh wê mala me xira bikin. Wê zarokan hişko biringo bikin." Û didomîne:

"Tirkîya ku bi kêrî şevê neyê jehr têkeve wê tirkiyê."

**Riza Uyar**



Weswese 2

# Rewşenbîrekî mixrikî xwe bûyî: Edward W. Said

Şener Ozmen

Çîrokeke balkêş e, di dawiya sala 1992'yan de BBC gava dest pê dike *Rêzegotarên Reithê* radigehîne cîhanê, xebatkarên dezgehê seba ku pêşkêşiya bernameya gotûbêjan ji rewşenbîrê filistînî yê navdar Edward W. Saidî hatiye xwestin, tek tûk be jî tûşî rexneyan dibin. Gilîgazinên ku ji qismekî rewşenbîrên brîtanî bilind dibin, ew in ku Edward W. Said, di şerê serxwebûna filistîniyan de yekî çalak e û nabe ku di platformeke lap î cidî û girambar de cî bigire û li ser pirsgirêkên herêmê, cîhanê û barûdoxê bipeyive. Lê belê çîroka balkêştir jî ew e ku Edward W. Said, di van rêzegotarên ku di BBC'yê de hatine pêşkêşkirin de, ên ku dû re li jêr navê *Representations of The Intellectual, The 1993 Reith Lectures* [1] bi edîtoriya Shelley Wagner a ji Weşanxaneya Pantheonê çap dibe, bîr û boçûnên xwe yên derbareyî kîbûn û çibûna rewşenbîr û rol û rawesta wê/wî ya li cîhanê, ji erebheziyê û totalîteriyê re dike gorî, ên ku di asta demargiriyekê de, di gotara wî ya di *London Review Of Books* de hatiye weşandin (*Edward Saidê Ereb û Amerîkayî, di pêşrojên berhevdanên aştiyê yên Iraq û Sovyetê de nivîsand*) derdikevin mexderê, ango di adara 1991'an de.

Gava min dest bi vê nivîsê kir, peyva 'aştiyê' nehat bîra min, nehat bîra min bê di kurmanciya gewr de me jê re çi digot! Halbûkî gelek peyvên jibirkirî, yên kêmnas, lazim, nelazim, roj pê ve dihatin bîra min û hinek jî bûbûn pizika ser lêvê. Ya rast, bihata hişê min jî, min nedizanî bê ez ê wê peyvê li ku bi kar bînim, di nivîsekê de ya ku hewil dida kêm û zêde li ser rewşenbîriyeke mixrikî hev bûyî ra biweste. Ma ne Edward W. Said bû yê ku digot; *"Peywireke rewşenbîran jî ew e ku, klîşe û kategoriyên ku bîr û boçûnên mirovan û pêwendiyên navmirovan xistine bin nîrê xwe daşikînin."* Çi ku wî bawer dikir ku çand –ji Rojava heya bi Rojhilatê– bi destekariya nîştergeriyê ji hevûdin nayên (divê neyên) veqetandin, ewqas ku kakil û dîroka wan têkelî êkûdin bûne û çandeke pireh –di wateya melezê de– a pêgirî ava kirine.

Welew ku wisan e, welew ku çanda kurdan, bi dirêjahiya mêjûya nifirlêbûyî tevlî çanda ereban, farisan û tirkan bûye (yan jî a van dewletên mêtinger tevlî çanda me bûye) û em ji heman kaniya çanda pireh, a ku bi niştera bîrdoziyê –ji qewlê Edward W. Saidî- hîn nehatiye jêkirin vedixwin. De baş e, çima em bi jehrî ketin!? Hem jî bi firta ewil re!? Çima zeviyên me, bax û bistanên me bi şewb û nexweşiyên curbecur hîç û pûç bûn? Bîhna sêvan fûriya ji dîrokê, jê û bi şûn de jî me xwe nedît! Halbûkî Edward W. Said gotibû; *"Bi min rewşenbîr, biqasî ku ji destê wan bê, divê dengê xwe bigihîne girseyên gel û wan kêm nebîne, çi ku gel, muxtebê wî yê xwezayî ye."*, heye ku em şaş bûn (weke gelek caran), heye ku Edward W. Said, qala kul û derdên gelan nedikir û nedigot rewşenbîr raserî partiyan e, raserî bîrdoziyê ye û nîştergeriyê nake. Radeya rastiya êşê çi ye gelo ji bo rewşenbîrekî fena Edward W. Said? Çi bû yan jî? Çi ku ew jî, weke Tariq Elî û Hemîd Dabaşî, pirsgirêka mêtingeriyê û têkoşîna kurdan, fena dek û dolabên Sîyonîstan û fen û fûtên emperyalîzmê didît, ji dêvla ku piştgiriyê bide doza kurdan (qet nebe li bîr û boçûnên xwe xwedî derketa), rê û dirbên çareseriyeke jiberkirî rêyî me dida, a ku li gorî wî diviya di nav dewletên desthilatdar ên heyî de bête safikirin. Loma di gotara xwe ya London Review Of Booksde,li dor peyva angaştê çerx bûbû, wekî çawan Iraq (û Sedam) hevwelatiyên xwe bi gazên kîmyewî kuştiye, ya rast, nediket bin kumê wî yê ku her ku diçû bêhtir dişibiya yê Sedam, bi tevî ku kurd hingê xwe ji bo daw û doza filistîniyan jî dikirin gorî. *"A soxîn wekî yekî temsîlkar a girîng rewşenbîr e; ya/yê ku vê yan wê bîrûboçûnê aşkera dike, bi tevî hemû keleman ya/yê ku vê temsîlê li ser navê gel dike, a ku wê ji xwe re wek muxteb dîtiye."* Navberekê, Said, navê zilamê ciwan ê *Joycesî* hildide, qala *Stephen Dedalusê Ulyssesî* dike (tê bîra min helbet, şevekê wergêrê *Ulyssesê,* şa'irê me yê gewre û dûredest Kawa Nemir, li ser vê mijarê dûvûdirêj peyivîbû) û li rewşa wî ya tenik hûr dibe; yê ku xwe bi neteweperweriya Îrlandayê bi nan û av dike, non serviam, ango tu dê xizmetê nekî! Ji kê re? Helbet ji tuxmê îngilîzan re! Bi dirêjahiya bendê, Stpehen bi nasnameya xwe ya îrlandî, rû bi rûyî bişavtinê dibe û li hemberî êrîşên maksîmalîstan radiweste, lê belê bi fikar e jî, xasma jî ji geşedanên neteweperweriyeke tûndûtûj. Joyce, wekî hemû nivîskarên mezin ên modernîst, têgiheke nasnameyê bi kar tîne, a ku bi çemka regezê ve pihêt girêdayî ye.



Ka em çend gavan ber bi dîrokê ve bavêjin û herin Îrlandayê; di salên 1890 û 1900'an de giringtirîn îş û amelê îrlandayîyan bûbû projeyên geşkirin û vejandina zimanê Galî, ne bi tenê ji bo hejmara kesên ku bi vî zimanî dipeyivîn zêde bikin, di heman demê de hewil didan ku zimanên wan têkeve gereke fermî, bibe parçeyekî pergala perwerdeyê. Tew, di sala 1897'an de, komeleyeke Galîyan, pêşbirkên li ser geşepêxistina zimanê Galî jî li dar xistibûn; *"Bandora Zimên Li Ser Neteweyê"*, *"Zimanê Îrlandî Dê Bi Çi Terhî Popûler Bibe?"*, xelat jî 5 Sterlîn bû, tiştên wehakîno ku ji me re gelekî xerîb tên. Serqisê, ne bi tenê Edward W. Said, wergerê wî jî di pêşgotina xwe ya di Kış Ruhuyê de (Ruhê Zivistanê) de ya ku ji nivîsên wî yên li ser mişextiyê, mêtingeriyê, antropolojiyê, oryantalîzmê, cîhan û bend û nivîs û rexnegiriyê hatine pê, navê Filistinê bi tîpên girdek dinivîsîne û bi ser ve dike; *"Berxwedêrê nebez ê daw û doza FILISTÎN'ê, teşhîrkerê tesewira Îslamê, ya ku di çapemeniya Rojavayê de bi awayekî çewt –bêguman îdeolojîk– hatiye vederkirin. (…) Gava li Tirkîyeyê navê Edward W. Said tê hildan, ev tênbîra meriv."* [2] Filistîn, Îslam û Tirkîye… ev her sê peyvên han, ji zû de ye di nav der û dorên hunera hevçax de –bêhtir di nav tirkên sekûler de– jî bûye rê û rêbazek ji boranêzîkbûna hunermendên esilkurd û pirsa wan. Dijberiya kurdan, yên herî sekûler jî bi nan û av dike, loma beriya bi çend salan, hunermendeka tirk a sekûler, bi e-mailekê lezelez qaşogiravî ben di guhê min re dikir wekî çawan ez tevlî pêşengeheke ku hunermendên cihû jî beşdarî lê kiribûn, bûbûm, bi tevî ku çend hunermendên ereb dest ji pêşengehê kişiyabûn, lêbelê tewqa xwe ji muzexaneyên cihûyan nebirrîbûn (heya vê gavê jî), ên ku berhemên wan kirrîbûn û tevlî koleksîyonên xwe kiribûn. Çi ku hingê Zizekê ku gotibû kurd, li Rojhilata Navîn, versiyoneke din a cihûyan in, rû ji wan badabû û kurd, bi awayekî eklektîk bi bîrûboçûnên Negri û Hardt tevdigeriyan. *"Yekê"* jî digot Edward W. Said parîyekî jî bi gazindokî; *"Digel ku qala kel û cehda ku min di ber gelî de dida dikirin jî, yên ku bi ti caran navê wî gelî hilnedidan jî hebûn. Filistîn hîn jî peyveke qedexekirî bû."*

Eynî wek navê Kurdistanê…

***Çavkanî***

***1-Pirtûka navborî, li jêr navê Entelektüel / Sürgün, Marjinal, Yabancı, bi wergera Tuncay Birkan, di sala 1995'an de ji nav Weşanên Ayrıntıyê derket. (n.n.) Bnr.***

***2-Kış Ruhu, Ji Edward W. Said Bendên Bijarte, Amadekar û Werger: Tuncay Birkan, Metis, 2006.***

# Stûneke hunera kurdî



Hunermend Seîd Gabarî stûneke hunera kurdî ku bêhtirî 40 salan e stranên kurdî çêdike û dibêje û xizmeta huner û folklora kurdî dike. Gabarî di 64 saliya xwe de koça dawîn kir

Hozan Emîn

Hunermendê kurd Seîd Gabarî di 64 saliya xwe de ji ber nexweşiya penceşerê di sibeha roja 4'ê gulana 2020'an de li nexweşxaneya Serdem a bajarê Hewlêrê canê xwe ji dest da.

Hunermend Seîd Gabarî stûneke hunera kurdî ku bêhtirî 40 salan e stranên kurdî çêdike û dibêje û xizmeta huner û folklora kurdî dike, di 13'ê nîsana 1956'an de li gundê "Xirbê kejê" yê girêdayî bajarê Amûdê yê rojavayê Kurdistanê çavê xwe li jiyane vekir. Gabarî hê 8 salî ye ji ber nexweşiyekê roniya çavên xwe winda dike û bi wî hawî jiyana xwe bi zor û zehmetiyeke mezin didomîne û di wan salan de dest bi strangotinê dike.

Nemir Seîd Gabarî di sala 1966'an de helbestvanên kurd ên navdar Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj nas dike û herdu helbestvanan bandoreke mezin lê kiriye û her wiha alîkariya wî kirine û han dane bo strangotinê û wî di wê demê de dest bi muzîkê kiriye.

**Helbestên Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj**

Helbestên her du helbestvanan dike stran û di sala 1967'an de dest pê dike xwe hînî jenîna tembûrê (bizqê) dike. Piştî du salan, di 1969'an de yekem car derdikeve ser dikê û stran dibêje. Ew bû pêngava wî ya yekem û ji wir û pê de navê wî derdikeve. Bi taybetî piştî sala 1970'î ku ji ber straneke şoreşgerî li konsereke mezin li Qamişlo hat girtin tê naskirin.

Wî pir îşkence û zehmetiyên biêş dîtin û gotinên stran û awazên kurdî lê qedexe kirin. Lê Seîd Gabarî xwe tu carî ji stran û awaz û gotinên kurdî dûr nekir û stêrka wî geş bû bi strana "Ey Bilbilê Dilşad" a gotinên wê yên Seydayê Tîrêj in. Piştî şikestina şoreşa başûrê Kurdistanê sala 1975'an, nav û dengê wî li Kurdistanê belav bû.

**Vegeriya başûrê Kurdistanê**

Her wiha wekî hunermendekî şoreşger di nav şoreşa kurdan de cih girt. Di sala 1980'yan de derbasî başûrê Kurdistanê dibe û bi hunera xwe tev li nav pêşmergeyan dibe. Gabarî destpêka salên 1980'yî derbasî Ewropayê bû û li Almanyayêbi cih bû. Piştî salên 2000'î vegeriya herêma Kurdistanê û li bajarê Hewlêrê bi cîh bû û heya koça xwe ya dawî kir.

**Stûneke bilind**

Bi koçkirina hunermendekî navdar ê mîna Seîd Gabarî hunera kurdî stûnekî xwe yê bilind winda kir lê wê her sax be di dilê gelê kurd de. Wek bilbilekî xemgîn li serê çiya û xwezaya Kurdistanê wê her bixwîne û wê bi huner, deng û bi awazê xwe her tim bijî.

# *Egîdekî muzîkê: Evdilmelek*

Mefer Kurdil

Ji perçeyê welatekî bindest ber bi bindestiyeke din ve, welat yek e lê dest pirr in li ser. Ji Amûdê ber bi bakur ve û ber bi paytexta welatekî xerîb ve, ji sala 1968'an heta sala 1992'yan 'emrekî bi kurdî, egîdekî pirrnav û hinekî jî bênav, dengekî bi bask ê li tu bajaran bi cih nedibû û hey difiriya.

Evdilmelek Şêx Bekir, li Enqereyê li zanîngeha Hacettepeyê dest bi xwendina tibê dike ji aliyekî jî bi wî dengê xwe yê bihuştî distrê. Ew û hevalên xwe "Koma Amed"ê ava dikin û albûma ewilîn derdixin bi navê "Kulîlka Azadî"yê bi keda destan derdixin û belav dikin dîsa dibe teyrek ev deng û li welêt digere.

Cara pêşî strana "Çaw Bella"yê ew werdigerîne kurdî û li nav stranbêjên kurd û kurdan bi nav û deng dibe.

Salên ji xortaniya me mişt bêriya welêt difûriya û bêhna hezkirina deşt û çiyayan. Dengê "Rindê"ya wî li ber guhên me bû, dengê "Lê Kejê" û gelek stranên din. Sewteke weke mîna li serê çiyayekî bayekî hênik li ber guhên mirov re derbas bibe; weke di tîbûneke bi sedsalan de mirov çav li kaniyeke avê bikeve.

Ew Melekek bû di Enqereyê de hilnehat baskên xwe vekir û ber bi Stenbolê ve firiya. Li wir bû "Melek Şengal", ne di tu bajaran de hildihat û ne jî tu navan têra wî dikirin. Kerbeke kevnar bi xwe re digerand bajar bi bajar. Li Stenbolê di NÇM'ê de cih girt, bi "Koma Çiya" re xebitî, stranên weke sirûdan ji Koma Çiya re nivîsand û beriya bixwîne li benda derketina albûmê nema ji Koma Çiya'yê ber bi refên çiyayan firiya û got:

"Bes e"
"Çar dor hawîr rengê xwîn e
welatê min bi kul û birîn e"

Di dawiya sala 1991'î de derket û çû, gelek tişt li dû xwe hiştin, gelek xebat. Ew di refên çiyayan de êdî bûbû "Dr. Cûma". Di nîsana 1992'yan de baskên "Dr. Cûma" şikestin firîna wî ya bedenî piştî wexteke kin, hate sekinandin lê dengê wî hîn li çiyayên Kurdistanê olan dide . Bi "Mizgîn"iyê:

"Mizgîn li we hevalno
Gelê kurd li ser piya ye"

xwebûn

11-17 Gulan 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 21

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazışleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Welatê Antîakos ê zîrek: Komagene[2]

Keştiya Alalû
**Agît Yazar**



... Dil dixwest me li welatê Antîakosê zîrek, ji paytext Samosatayê dest pê bikira. Lê ji ber paytexta Komagene Samosta di bin ava bendava Ataturkê de maye, encax bi cil û bergê noqavgêr (dalgiç) ê profesyonel me dikarîbû xwe berda binê avê û Samosata bidîta. Her çiqas min xwe ji vê yekê re xweş kiribû jî, lê min ev daxwaza xwe taloqî havîneke din kir û em ketin ser riya havîngeha Komagene, Arsemiyayê. Çawa dinêje, Arsemiya paytexta Komagene a duyem dihat hesêb.

Di rê de, xeyalên Samosata yên min ew di dîmenên reş û sipî de dîtibûn, li ber çavê min zindî dibe. Samosta, nola jineke ducanî xwe li ser piştê dirêjkiribû û hêdî hêdî av dida ser girê qesir û konaxên Şahînşahê li ser hatibû avakirin...

Heta em diçin Arsemiyayê, xeyalên min ên reş û spî xumam digire. Bi temamî ez wan xeyalan bi awayekî demî di bîrdanka xwe de diqerisînim û ji hêla rojhilat ve li ser milê xwe yê çepê dadigerim nav bajarê Arsemiyayê.

**Arsemiya**

Bajarê Arsemiyayê, li ser bilindahiya çiyê hatiye avakirin û navê xwe ji navê bavê bapîrê Antîakos wergirtiye. Em deştê didin milê xwe yê çepê û di xaçirêka berpalê re dimeşin. Li ser milê çepê, kêlberê Mîtrates Kalînîkos eniya xwe daye roja piştî nîvroj û zîq li hêla rojava dinêre. Terkên li ser rûyê wî yên xwezayî, dîtbariyeke piştrastkirinê ya mirovekî ji dem û dewranên berê dida peykêr.

Em jî berê xwe didin wê devera awirên Mîtrates Kalînîkos arasteyî ser bûye û dimeşin. Li berpala Arsemiyayê, di nav darên berû û mazî de, kêlbereke din derdikeve pêşberê me. Li ser vê kêlberê, mîna meriv mêvanê xwe pêşwazî bike, Antîakos ê zîrek bi destê Heraklesê bi hêbet girtibû. Ez jî diçim destê xwe dirêjî wan herdu mirovên xwedî keramet dikim. Li hêla min a çepê, Antîakosê bi zîrekî û culhetê xwe, derketibû dereceya xwedewendan, li hêla min a rastê jî Heraklesê xwedawendê hêz û hêbetê bû. Û destê min ê ji goşt û hestî, enerjiyeke muazem ji destê wan ê kevirî dimêje.

Bi baldarî ez li cil û bergên Antîakos ên tev hilkişandî hûr dibim. Xeftan û hewranê wî, şûr û şilfê wî, kemer û navtenga wî, a herî girîng jî taca li ser serê wî ya ji tîrên rojê, meriv ji xwe re bengî û bendewar dihişt. Awirên wî yên tûj, di bin birûyên wî yên nola hêva du şevî û li ser rûyê wî yê kurrkirî, şek û jîrikî, diteyisîn. Taca wî ya bi tîrên rojê yên tûjik, eyan beyan asta serê Herakles derbas kiribû û ji jor ve zîq li hundurê çavên Herakles dinêrî. (Jixwe ji bo meriv stêrk, berû, gupikên ji serê şêr û sembolên din ên li ser cil û bergên wî şîrove bikin, divê meriv di beşa ilmên stêrkzanî û yên din de tibabekî pîspor be. Loma jî ez ê vê yekê bihêlim ji hêviya kesên pîspor re)

Heraklesê nîvyezdan, li hemberî Antîakos hinekî gevçilandî hatiye sêwirandin. Li ser vê kêlberê, em Herakles dîsa tazî û dest bi ço dibînin. Zend û bendên wî yên lihevbadayî, zik û sînga wî ya bi reh û rinc, nola gurcika gê wanî girêk girêkî sêwirandî ye. Porê wî, riyê wî û mûyê wî yê heram, bi awayekî eyan kurîşkî ye. Ger tu baş bala xwe bidiyê, şêrek nola pisîkekî çawa xwe bi nigê xwediyê xwe bifirikîne, wanî li pişt nigê Herakles fitilî ye û xwe pê difirikîne, balê dikşîne.

Antîakosê qralê Komageneyê, yê herî navdar, ne mîna grekiyan û ne jî mîna persan bi rîh e. Di wê serdemê de di nav împeretoriya Romayê de jî, rûterraşkirin moda esalet û esilzadebûyînê bû. Li gorî ez lê dikolim, bavê Antîakos Mîtrates Kalînîkos û her wiha kalikê wî Samos jî riyê xwe her kurr dikirin. Jixwe peykerê wan jî welê rûterraşkirî ne.

Mîna meriv tiliya xwe danîbe ser dîkê tivingê, ez wanî tiliya xwe didim ber devê xwe. Ez di dilê xwe de, ji xwe re dibêjim: gelo ev moda rûkurkirinê, ji Komageneyê derbasî romayiyan bûye, yaxwud ji romayiyan derbasî komageneyiyan bûye? Hasilî kelam, hîn cihê ez lê bigerim pir in û lewre ez hîn pirtir li vê pirsa xwe tîr nabim. Ez destê Antîakos û mêvanê wî Herakles dihêlim di destên hev de û berê xwe didim tunelên mişt bi raz.

**Ev tunel dadikevin ku gelo?**

Ez xwe di tunela hêla rojhilat re dikim û pêpelok bi pêpelok dadikevim jêr. Digel dinya pirr germ bû jî, her ez dadiketim jêr, bayekî hênik li eniya min a xwêdandayî dixîne. Ez tibabekî dadikevim jêr, li wir êdî pêpelok diqede. Lê tunel berdewam dike. Êdî tunela bê pêpelok û serberjêr, nola gewriya ejderhayekî dixuyê. Zemîna şemitokî, fikaran li min zêde dike. Ger ji wê xalê û pê ve nig ji bin te bişemite, ka xwedê zane tu yê avê li ku derê vexwî!

Ez li wê derkê dibêjim zinq û disekinim. Li ber lempa telefona xwe ez li notên xwe dinerim. Tê gotin li jêra jêr, tirbeke ji du jûran pêk tê heye. Yek a Mîtrates Kalînîkos e, ya din jî ya serkeşîş e. Gelo heta niha kî û bi çi awayî daketiye heta jêr, ev baş nayê zanîn. Dibe ku bersiva van pirsan, li ser devê tunelê hatibe nivîsandin.

"Min xistibû aqilê xwe ku ez ê rojekê liyaqî pêşiyên xwe bim. Loma min bi baldarî, emanetên mezinên xwe yên pîroz, rakirin ser nigan, yan jî min ew ji nû ve li gorî şan û şerefa wan dan çêkirin yan jî min dan tamîrkirin. Min her tişt bi hûrmetî û baldariyeke mezin pêkanî. Bi vî awayî min ev emanetên pîroz yên bîrdariyê, bi îhtîşamtir û mezintir ji yên piştî min werin re hişt." Belê. Antîakos ê jîr û zanemend, ev gotinên dîrokî li serdera tunela tirba bavê xwe Mîtrates Kalînîkos nigarandibû û wekî mîras ji yên bişt xwe re hiştibû.

Li hêla rojavayê kêlbera qral Antîakos û Herakles, tuneleke din heye. Ev tunel, ji ya din firehtir e. Diyar e ev tunel ji bo di şerekî muhtemel de xwe tê re xelas bikin hatiye kolandin. Tunel, seraping ji tahtê hatiye kolan.Tişta tê gotin, ev tunel xwe berdide heta çemê Kextaya kevn û heta di binê çêm re derbasî hêla din dibe. Lê ji ber ev tunel bi caxên hesin hatiye girtin, tenê tu dikarî 10-15 gavan dakevî jêr.

Ez 10-15 gavan dadikevim heta jêr. Bi her du destan caxên hesinî digirim û li tunela zinc-î reş dinêrim; heta çav çavan dibirre, tarî ye; welê tariyeke tîr e, edetî tîr tê de naçe xwar! Çaxa ez li mebesta kolandina vê tunelê difikirim, çermê cesedê canê min tê li ser tepelika serê min dicive li ser hev û mû li laşê min dibe şûjin. Ez wer hest dikim ku ji kûrahiya tunela reş-xeniqî, hîbehîbek tê. Ew çendî tiştekî bi xofdar e rebbî!; hîbehîb, edetî qutufîner e!

**Perre**

Dotira rojê, em vê carê berê xwe didin bajarê miriyan yê Perre. Ev bajarê Komagene, hema bigire li perê Semsûrê, hêla bakûr e. Ev bajar, bi tirbên xwe yên ji tahtê hatiye kolandin navdar e.

Ev tirbên hanê, her yek ji wan yê malbateke esilzadeyekî bûye. Gava meriv dikeve hundurê tirbê, di zikê tirbê de, şeş yan jî neh nîş derdikeve pêşberî meriv. Di nîvê tirbê de wekî hêwaneke piçûçik heye. Diyar e ew hêwanok, cihê gorîgehê ye. Çaxa kes dihatin ziyareta miriyên xwe, xwarin û vexwarina herî bi çêj a hingê dixistin wan gorîgehan. Hêjayî gotinê ye ku roja me ya îro jî ev keveneşopî, bi navê "şîva miriya" tê dayin.

Tişta bala min dikişîne ev bû: kesê mirî heke şervanek be, şûrê wî, heke bazirganek be hinek dirav datanîne li ber serê wî kesî. Ango her kesek li gorî statuya wî hatiye definkirin. Tiştekî din ê balkêş jî ew e, hema hema di nav van tirban tevan de, şûşekên rondikan hatine dîtin. Baş e, çi ne ev şûşekên rondikan? Rîwayet ew e ku çaxa kesek dimire, ji bo rêzgirtina li hemberî mirî, hezkiriyên wî/ê, kesî/ê, şûşeyek dane ber çavên xwe û rondikên çavên xwe herikandine hundurê şûşeyê ta şûşe ji rondikan tije bûye.

Tê gotin, dewlemendan, dirav dane xizanan û wan xizanan ji dêlva wan ve li ser miriyên wan girîyane û ew rituela şûşe ji rondikan dagirtinê pêk anîne.

Ji bilî tirbên Perreyê yên cihêreng, her wiha aşê zeytê, firin, şerabxane û gelek avahiyên din hene.

Li vî bajarê ku hîn pir tişt di binê erdê de veketiye û li benda derketina ronkahiya rojê ye, ez û nivîskar Mehmet Oncu bi hev re li navê bajarê Antîk ê Perreyê digerin. Ez dizanim ku Mehmet Oncu, deh salan midûrê çandê yê Semsûrê bûye û ew bi xwe ji vî karî teqawit bûye. Loma jî ez ji gotinên wî derdixim ku gelek tiştên veşartî di bin zimanê wî de hene. Hasilî kelam bi awayekî şîrînok ez li dora wî diçim û têm. Ew jî di wê zanebûnê de ye ka ez li çi digerim û nola kesekî berpirsiyariyek li ser milê wî be, wanî tevdigere û şekirekî ji bin zimanê xwe derdixîne: belê, rojekê dostekî wî, li wan derana digere û peykerxaneyeke tije peyker li wan deran cîyekî, di binê erdê de dibîne.

Ez vê razê û raza mozaîqên di bin erdê de, nola emanetekî pîroz qebûl dikim û em lêdixin bi hev re vedigerin Semsûrê.

***

Pilansaziya me ew bû ku em ê dotira rojê biçûna Qere Qûş, Pira Cenderê û herî dawî jî derketana lûtkeya çiyayê Nemrûdê, ser textên xwedawendan. Lê ji bo em bernameyê bigihînin weşanê, em vedigerin Amedê. Mexseda me ew bû piştî meheke din, me gera xwe ya li welatê Antîakosê zîrek a nîvçemayî bi encam bikira. Piştî meheke din, em vê gerra xwe taloqî biharê dikin.

Lê vaye bihar jî hat!... Heke ev şewba koronayê ya nola kabûsekî ji ser me rabe, yekser berê min li çiyayê Nemrûdê li ba textê xwedawendan û tirba Bîrdariyê ya Antîakosê jîr û zanamend e.

Hêvî ji Ahûra Mazda ku bihara me beravêtî nebe. De hûn jî bibêjin amîn!

***(Didome)***